

## Çar parçeyî ra yew veng "Kobanê"

Wexto ke qala Kobanê yena ma vîrî, sarê ma beno berz. Wexto ke yewî vat Kobanê, sereberzîya şarê ma yena vîrê ma. Kobanê semedê ma hişmendîya ma ya giran a. Kobanê seba ma herra mergî xo ser ra... ***Av. Cemile Turhalli / R.9***



## Parrhesîa: Ev der Kurdistan e

"Zimanê me tê înkarkirin. Nasnameya me tê înkarkirin. Kurdistan tê înkarkirin. Em li hemberî vê yekê ne, em hene... Ev der a ku tu niha lê yî, Kurdistan e. Lê mixabin ev Kurdistan li meclisê tê înkarkirin." Bêguman kesên... ***Hisên Çatikkaş / R.6***



## Bandora travmaya koçberiyê!

Polîtîkayên dewletê yên neqebûlkirina hebûna kurdan kir ku bi milyonan kurd ji ax û warên xwe berê xwe bidin bajarên Tirkiyeyê. Her koçberî bi xwe re êşên gelek mezin anîn. Ligel wan êşên ku di beden û ruh de zû bi zû... ***Dûrket Suren / R.2***

# xwebûn

15-21 MIJDAR 2021 HEJMAR: 100 BUHA: 5 TL rojname@xwebun.org

## Trajediya koçberên kurd!

Pirsgirêka koçberan a li ber deriyê Yekitiya Ewropayê, bêyî jê re çareseriyek bê dîtin didome. Bi hezaran koçber bi hêviya ku derbasî Polonyayê bibin, li ser sînorê vî welatî ji aliyê eskeran ve hatine sekinandin. Esker ji bo pêşî li derbasûna wan bigirin gelek caran darê zorê bi kar tînin. Koçberên ku piraniya wan ji kurdên başûrê Kurdistanê ne, li daristanên ku dişibin kampên ser vekirî dimînin. Di vê demsala sar de jin, zarok û temenmezin zehmetiyên pir giran dijîn. Koçberên bêçare hatine hiştin li benda alîkariyê ne. Saziyên alîkariyê tevî hemû astengiyan kêm be jî hewl didin... ***Felemez Ulug / R.6***

## 'Em ê eslê xwe ji bîr nekin'

Di salên dawîn de desthilata AKP'ê polîtîkayên xwe yên pişaftinê yên li dijî kurdan şidandiye. Ji bo vê jî bi partiya faşîst û netewperest a Tirkiyeyê MHP'ê re dostaniyeke kûr daniye. Ji sala 2015'an ve li gorî vê dostaniya bi MHP'ê re polîtîkayên bêyom li dijî kurdan tên diyarkirin. Di çarçoveya van polîtîkayan de geh êrîşî xwezaya Kurdistanê tê kirin, geh êrîşên leşkerî tên lidarxistin û geh jî êrîşî çand û zimanê kurdî tê kirin. Jixwe operasyonên qirkirina siyasî û çandî qet ranewestiyan. Armanca vê polîtîkayê korkirina hestên neteweyî yên kurdan e. Dixwazin kurd bi kurdî... ***Kadrî Esen / R.8***

## Têkiliya hiş û zimên

Peydabûn, pêşketin, erk û fonksiyona çalakiyên zimanî ji destpêkê ve bûye mijara lêkolînan û bala filozofan û fikirdaran kişandiye. Arîsto digot armanca ziman ew e ku tiştekî yan fikrekê bi zelalî rave bike. Di vê çalakiyê de, derbirîna tiştên nava hişî esas e. Jixwe heta ku fikir di nava hişî de bimîne û dernekeve derve, nikare çalak jî bibe. Çalakiya yekem a fikrê, derbirîna wê ye. A ku divê bala me bikişîne, gelo mirov kîjan zimanî bi kar tîne û wî zimanî jî çawa bi kar tîne.Pirsgirêka zimanî ew e ku di rêya derbirîna ramana hişî de gelo şiyana... ***Îbrahîm Seydo Aydogan / R.5***

# Kurd dê her azad bijîn

Tirkiye ji roja ku Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê rêveberiya xwe ya xweser ava kiriye ve bênavber êrîşên xwe didomîne. Herî dawiyê di 9'ê mijdarê de êrîşek li Qamişloyê pêk anîn. Di êrîşê de ji malbata Gulo 3 kes hatin qetilkirin. Bi deh hezaran kurd bûn lehî û cenaze spartin axê. Di merasîmê de gel peyama "Em yek jî bimînin em ê her tim azad bijîn" da... ***R.7***



# Dê bi ruhê seferberiyê tev rabin



KON-MED'ê, xwest ji bo bidawîkirina tecrîda li ser Ocalan divê CPT û Konseya Ewropayê tavilê bikevin nava liv û tevgerê. KON-MED'ê bang li hikumeta Federal a Almanyayê, NY, civakên dewletên navneteweyî, OPCW kir ku bi erka xwe rabe û got: "Em bang li gelê li Ewropayê û dostên xwe dikin ku ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo, li dijî dagirkerî û êrîşên kîmyewî di 13'ê mijdarê de bi ruhê seferberiyê tev li çalakiya li Strasbourgê bibin... ***R.3***

## Mirina Mustafa Kemal

Rojekê li herêma Qerejdaxê, ji nav eşîra Şehîn a gundê Çepenya yek diçe eskeriyê. Çend mehên wî diqedin, di dehê mijdarê de, roja mirina M.Kemal e. Dema ku seat dibe, 9 û 5 deqe, her kes dikeve rêzgirtinê, dibê wîze wîza korneyên makîneyan û herkes di cihê xwe de di sekinin û destên xwe bi kêlekên xwe ve... ***Fatma Taşli Tunç / R.10***

## Koçberiya li Sûrê

Şerê demdirêj ê li Sûrê di navbera 2'yê kanûnê 2015'an û 10'ê 2016'an pêk hat. Di şer de zêdetirî 3 hezar kesan jiyana xwe dest dan. Zêdeyî 22 hezar kes koçber bûn. Piştî şer rayedarên dewletê bi hinceta "Veguhertina bajêr" ji sedî 70'ê xaniyên li Sûrê xera kirin. TOKÎ'yê xaniyên wekî girtîgehê ava kirin. Di 21'ê adara 2016'an de Lijneya Wezîran di nava 7 hezar û 714 erseyan de ji bo 6 hezar û 292 erseyan biryara "cemaweriya lezgîn" da... ***R.3***



## Dîroka aş û aşvaniyê

Mirovan bi çandina genim û avakirina şaristaniyê re, ji genim arvan, savar û berhemên din bi dest xistin. Mirovan ji bo ku genim, ceh, garis (gilgil) hwd. bihêrin bi rêzê; destar, deng... ***Nasirê Torî / R.12***

## Nexweşxane bûne tîcaretxane

Li Tirkiyeyê piştî hikûmeta AKP'ê hat ser îqtîdarê, polîtîkayên qada tenduristiyê li gorî daxwazên bazirgan û sermayedaran pêş xist. Hejmara nexweşxaneyên taybet zêde kir û nexweşxaneyên dewletê jî kêm kirin. Ji ber qada tenduristiyê kirine qada bazirganiyê, êdî nexweşxane bûne tîcaretxane û nexweş jî bûne wekî muşteriyan. Ev jî dibe sedem ku êdî welatî nikarin sûdê ji xizmeta tenduristiyê bigirin. Dîsa ji ber xizmetkarên tenduristiyê zêde kar dikin, her salê zêdeyî hezar xizmetkarên tenduristiye koçî derveyî welat dikin. Hinek ji wan întîhar dikin û hinek jî îstîfa dikin. Em têkildarî rewşa tenduristiyê, polîtîkayên îqtîdarê yên tenduristiyê û têkoşîna TTB'ê bi Endamê Lijneya Navendî yê Yekîtiya Bijîşkên Tirkiyeyê Halîs Yerlikaya re axivîn... ***Hevpeyvîn / M.Alî Ertaş / R.4***

# Bandora travmaya koçberiyê!



Dûrket Suren

Polîtîkayên dewletê yên neqebûlkirina hebûna kurdan kir ku bi milyonan kurd ji ax û warên xwe berê xwe bidin bajarên Tirkiyeyê. Her koçberî bi xwe re êşên gelek mezin anîn. Ligel wan êşên ku di beden û ruh de zû bi zû nayê cebirandin jî kurdan bi israr dev ji têkoşîna xwe ya maf û azadiyê bernedan. Ya ku hêz da wan û wan li ser pêyan hişt jî bêguman maneya ku wan dida vê têkoşînê bi xwe bû.

Der barê koçberkirina bi darê zorê de rojekê li ser medyaya dîjîtal rastî vê hevokê hatibûm: "Bandora travmaya koçberiya bi darê zorê encax dikare bi 4 nifşan şûn ve bê derbaskirin." Derûnasekê nivîsîbû. Bi vê hevokê dîroka me ya kurdan a ku her bi koçberî û sirgunkirinê re rû bi rû maye, fikirîm. Kurd ev çend nifş in hê jî travmayên bi vî rengî dijîn û di her mînakek wiha de bi civakî di bin tesîra wê de dimînin. Em kurd wekî miletekî din nikarin ne êşên xwe, ne birînên xwe, ne jî travmayên xwe bijîn. Tenê di dîroka dawî ya sed salan de kurd çend sed car rastî vê îşkenceyê hatine êdî mirov nikare bijmêre. Yanî bifikirin ger travmayeke koçberiyê ya li ser kesekî ew qasî bi bandor dikare derbasî çar nifşên din bibe, ew îşkenceya di laş û mejiyê mirovan de çawa bi têsîr e, em mileteke çawa hatine êşandin ne hevok ne derûnas dê nikaribin rave bikin.

**Tarlabaşi cihê koçberan**

Yek ji bajarên ku kurdan lê koçber bûne metropola herî mezin a Tirkiyeyê Stenbol e. Ez ê nivîsa xwe ya yekemîn a li ser jiyana kurdên li Tirkiyeyê ji vê derê ji taxa Tarlabaşiyê dest pê bikim.



Tarlabaşi yek ji wan ciha ne ku bandora koçberiyê tu heta dawiyê lê dijî. Ji gelek welatên Rojhilata Navîn bigirin heta Afrîkayê gelek koçber li vê taxê hene. Li navçeya Beyoglu ya Stenbolê ev taxa ku ji rum, ermen, suryan, cihû û gelên din ên ne misilman maye (bi qanûna tehcîrê gelekî wan hatine koçberkirin) îro ji koçberên kurd û gelên din re mazûvaniyê dike. Bi gotineke din rûyeke din a dîroka Tirkiyeyê ya koçberkirina bi darê zorê ye, ev tax. Der barê hisiyata ku vê taxa kurdewar daye min dikarim gelek tiştên baş binivîsim, lê xerabiyek dikare gelek başiyan bide wendakirin, ji ber vê yekê jî ez ê di vê nivîsê de behsa tiştên ku min pir êşandine bikim.

**Taxake bênasname!**

Ev tax niha bi firoşkarê esrarê, bi bazirganên tiryakê, bi dizî û etîketên her bi vî rengî yên nebaş tê bîranîn. Ev weke rastiyek li aliyekî, di heman demê de taxeke koçber, taxeke welatparêz, taxeke xizan, taxeke mexdûrê veguhestina bajêr, her wiha taxeke bênasname li pêşberî me disekine.

**Li dijî kurdan polîtîkayên taybet**

Tarlabaşi, bi taybetî ji salên 1990'î vir ve yek ji wan taxan e ku bi hezaran kurd xwe spartine wê. Dema hûn ji Taksîm û Îstiklalê xwe berdidin kolanên wê, avahiyên ku ji ber veguhestina bajêr hatine xerakirin û bi vê yekê çawa dîroka taxekê, çanda taxekê jî hatiye xerakirin li ber çavan raxistiye. Xerakirin tenê di avahiyan de nayê kirin. Bi salan in çawa ku li Kurdistanê li ser zarok û ciwanên kurdan polîtîkayên taybet tên meşandin, li bajarên Tirkiyeyê yên kurd lê dijîn jî heman polîtîka tên berdewamkirin. Ev kolanên ku kurdan xwe spartinê her çi qas welatparêziya xwe biparêze jî, dewletê wisa kiriye ku hilma ciwanên wê bi her nebaşiyê were sekinandin. Belê li kolanên wê kurdî tê axaftin, çanda cîrantiyê tu hê jî dibînî, hisiyata ku tu li Kurdistanê ye dide te ev tax. Lê heta ku ciwanên me heta qirêkê di nava qirêjiyê de bin, ev der bûbe navenda fihûşê mixabin dê tu hisiyat maneya xwe negire.

Dema di kolaneke wê de min kameraya xwe dizivirand dengekî bi hêrs ez veciqandim, bi tirkî ji min re got 'Xwakê tu nikarî van deran bikişînî'. Bi kurdî axivîm, min xwe da nasîn û ev yek kir ku hêrsa wî hinekî hênik bike. Li her deveran firoşkarê esrarê hene, li her deveran endamên çeteyan hene û nayê xwestin tu kes û li cihên wan bikevin nav kadrajan.

**Nivîsa 'Azadî'!**

Di dîwarekî de nivîsa 'Azadî' tu dibêjî qey li rûye min dide. Em çendî ji azadiyê bêpar in ev nivîsa di dîwar de her tiştî rave dike. Kolanên Tarlabaşiyê ku ji her deverên Kurdistanê kurd ji xwe re kirine stargeh, îro bûye warê çete û helandinê. Zarokên ku bi tiliyên xwe nîşaneya azadî û serkeftinê ji kameraya min re dikin pêşeroja me hemûyan e û divê ev zarok ji van qirêjiyên pergalê werin parastin. Berê zarokên ku li kolanan mezin dibûn, ji xwe bawer bûn, nedihatin asêkirin, li dijî pergalê serî radikirin, dibûn şoreşger. Niha jî çi qirêjî hebin li kolanan tije bûne û tu ji aqûbeta van zarokên delalî ditirsî. Ev tiştên ku min li Tarlabaşiyê dîtin, bi rastî jî dilê min diperitîne.

**Kampanyaya Meclisa Ciwanan**

Kampanyaya Meclisa Ciwanan a HDP'ê ya 'Bikeve Tevgerê' di vî milî de divê ne tenê kampanya, di heman demê de wek seferberiyê be. Ew dirûşmeya wan a "Li hemberî tiryakê bêdeng nemine, tax û civaka xwe biparêze" ji dirûşmeyê wêdetir e. Heta ku ciwanekî me di wê qirêjiyê de bimîne divê kurd êdî xew li xwe heram bikin. Heger ciwanên te bikevin, bizanibe tu yê jî bikevî û travmaya wê dê ji koçberiya ku hetiye jiyîn hê bi jantir be!

## Bi kedê tehm û wateya jiyanê xweş e

Jina bi navê Helîm Bilêl a ji navçeya Qinê ya rojavayê Kobanê ye, behsa çandiniyê kir û diyar kir ku jin afirînerên jiyanê ne, bi keda destên jinan hemû cureyên çandiyê bi bereket dibin lewre ew ji çandiyê fêm dikin û li gorî wê dixebitin. Bilêl da zanîn ku ji her tim xwediyê kedê ne, bi kedê tehm û wateya jiyanê xweş e û wiha got: "Em di her demê de karekî dikin, rast e mirov diweste lê bêkar nabe. Em fêr bûne ku çandiniyê bikin, her kes di nava erdên xwe de li gorî demsalê şînahî, fêkî û sebzeyan diçîne ger alîkarî pêwîst be em alîkariya hev dikin." ***KOBANÊ***

## Xwe bi hunerê îfade dike



Jina ciwan û penber a bi navê Xurbet Tunç ku ev 28 sal in ji ber zilm û zoriya dewleta tirk ji gund û warên xwe yên bakurê Kurdistanê penaber bûye û niha li Wargeha Penaberan a Şehîd Rustem Cûdî (Mexmûr) dijî, bi xêzkirinên xwe êşên jinên penaber li ser rûpelên spî dinexşîne. Têkildarî xêzên xwe Tunç diyar kir ku ew ji zarokatiya xwe ve êş û azarên civaka xwe, bi taybet êşên jinên penaber li ser rûpelên spî xêz dike û got ku ew xwe bi hunerê îfade dike. ***MEXMÛR***

# Avakirina ziman û zanîna jiyanê

Îdiaya jineolojî bibe zimanê jiyanê û di vî alî de zimanekî biafirîne nokteyek girîng e. Di xebatên ku di vê mijarê de hatine kirin de tecrubeyek girîng derxistin holê. Lê çiqas zimanê vê ava kirine? Zimanekî herikbar, zelal, enerjiya wê ya wate û hîsî çiqas ava dibû? Di seranserê dîrokê de nivîs qada pergala serdestiya mêr bû û aliyên me yên em xizmeta wê dikin çi ne? Em çiqas bi tecrubeya jiyana xwe bawer dikin, em çiqas xwedî bi hêz in ku bi xwe binivîsin û hunerê îfade bikin? Me aliyên neşênber û teorîk çiqas çareser dikir? Li dijî kemînên qada akademîk ku zimanê zanistê diafirîne, em çiqas bi tecrubeyên jiyana xwe bawer dibûn û me çiqas bi nirx didît? Mêr zanîn û zimanê jinan her tim bênirx dîtibû. Me yê li dijî vê zimanê zanîna xwe çiqas ava bikira, me yê çawa bigihanda forma hunerî û wêjeyî? Dîsa ji bo çareseriya pirsgirêkên jin û civakê me yê zimanê ku çareseriyê diafirîne çawa ava bikira?

Lijneya weşana Kovara Jineolojiyê di vê mijarê de tecrubeya xwe wiha tîne ziman: "Ji bo xebateke di îdiaya zanîna civakîbûnê de, di nivîsên tên bikaranîn de zimanê tê bikaranîn gelek girîng e. Avakirina zimanê zanînekê, derxistina anatomiya vê zimanê û xîtabkirina hemû civakê, di îdiaya ku bibe zanisteke bîrdoziya jiyaneke nû, îfadekirina hêza çareserî û fikr û nerînê de girîng bû. Di destpêkê de me cih bi cih tevlibûna ziman, di nokteya hûnandina zimanê zanistê ya civakî de zehmetî kişand. Ji bo em ji terza nivîsandin û şîrovekirin û fêrbûnê ku modernîteya kapîtalîst bi salan fêrî me kir, xilas bibin û bikevin faliyetên zanisteke cuda, di alî me de zehmet bû. Hem rexneyên ji xwendevanan dihat, hem jî em kesên di xebatên me de cih digirtin, ev mijar li ber me wek kêmasî bû. Di vî alî de me di her hejmara xwe de bi baldarî hewl da zimanê xwe zelal bikin. Di vî alî de rexneyên xwendevanên me gelek girîng bûn û piştgiriyek cidî dane me.

Bi hişmendiya zimanekî bi hev re me ev mijar girt dest. Me hedef kir ku terza nivîsandina pirtûkên klasîk ên akademîk ji ser xwe biavêjin. Li ser vî esasî me di dawiya nivîsan de pêşniyarên xwe kir. Ev rêbaza ku gelek caran bû sedema bertekan, di nava demê de bi nivîskarên me re jî bû sedema guherînê. Guherîna bi jineolojiyê di zîhniyeta me de ava bû, bandor li zimanê me jî kir. Me zêdetir wate da tespîta Heîdegger a ku dibêje hebûna ziman mala me ye. Me wateya pratîkirina lêgerîna ziman a hemû aliyan dihewîne ya Helene Cîxous kifş kir. Di hevoka 'em careke din xwe di cudabûnên xwe de heps nekin nekevin kemîna serdest' a Sîmon de Beauvoîr de me carek din girîngiya hemû hebûna ziman dît. Me vegotinên rojnîvîskên şervanên azadiyê Zeynep Erdem, Suna Çîçek, Pinar Baglar û gelekên din esas girt. Navendên Lêkolîna Jineolojiyê yên li Rojava hatin avakirin vê lêgerînê wiha îfade dikin: 'Ji bo avakirina teoriya azadiyê ya çavkaniya jê xwedî dibe, li dijî hilweşînên pergala serdest, bi pêşengiya jinan, hewcedarî bi afirandina ziman û vegotina jiyana azad hebû. Ji bilî xweparastina rewa, di siyaset, aborî, perwerde, edelet, tenduristiyê de rastiyeke pêşengiya jinan mijara gotinê bû. Hewce hebû ku jin nekeve zimanên pozîtîvîzmê û bi rêbazên xwe zimanê xwe ava bike. Li ser rêbazên nîqaş û perwerdehiya rexne dike, hat sekinandin. Di atolyeyên çîrokan ên ji bo zarokan hatin avakirin de, me dît ku zimanê mîtolojîk, helbest, çîrok û stranî çiqas nêzî xeyala zarokan e. Girîngiya şoreşê ya perwerdehiya bi zimanê dayikê di van atolyeyên çîrokan de zelal derket holê.'"



Enstîtuya Andrea Wolf: "Di pêvajoyên perwerdehiyê de me çiqas xwe û hev û din nas kir, me kesayet, kolektîf û dîroka şexsî nas kir û îfade kir, rêbazên çareserkirina fêmkirina şaş, bi pirsgirêk û nakok jî ev qas dikare bê dîtin. Pêşxistina pêvajoyên fêrbûn û teşeyên jiyana kolektîf, di heman demê de di esasa hedef û rêgezan de, tê wateya fêrkirina fêmkirina cudahiyan û nirxdayînê. Beyî ku curebûna terzên îfadekirin û zimanê dayikê, em wek pêvajoya pêşxistina zimanê hevpar dijîn. Li gorî ferhengê em hinek têgehan li zimanekî din wergerînin wateya xwe winda dike yan jî rê li ber wateyên şaş vedike. Mînak kurdî ku tê wateya hezkirin û parastina çand, ziman û axê, di latînî 'Patrîotîzm' (Welatê bav) de xwedî wateyek cudaye. Di aliyê ku bi giştî naveroka wateyê bê fêmkirin de ev mînak gelek baş e.

Gotinên jinên ku dibêjin divê Jinwar bi çavên dil bê vegotin jî hesta hûnankirina ku zanîna jiyanê çawa tê kirin, vedibeje: 'Jinwar bi îradeyeke kolektîf zanîna ku jiyana azad ava dike, hat hilberandin. Ji bo pirsgirêkên civakî çareserî afirand. Di Jinwarê de zanîna civakî ya dîrokî hat nûkirin. Ji bo jiyana dê û zarokên wan çîroka Dara Mirada, Girê Miraza û Siyabend û Xecê hat destgirtin.'"

Jinên ji Beşa Jineolojiya Zanîngeha Rojava jî zimanê jineolojiyê wiha îfade dikin: "Jineolojî zanistek nav civaka xwe de vejiyaye. Zimanê wê jî zimanê jiyan, civak û jinan e. Di civaka me de yên pir kêm bizanibin, fêm dikin ku jineolojî kokên xwe ji civakê digire. Bi qasî fêmkirina rastiya civakî û dîrokî, nîşandana hêza vegotinê jî yek ji lêgerînên me yên sereke ye."

Di atolyeyên jineolojiyê de li aliyekî nîqaş û xwendinên felsefe, zanist, zanista civakî û pozîtîvîzmê tên kirin û li aliyê din jî avakirina gotin, têgeh, rêbaz û zimanê zanista jinan bû lêgerîna esasî. Ne tenê di zanist û felsefê de; zimanê ji aliyê serdestiya mêr ve li her qadê tê bikaranîn, têkiliya wê ya bi desthilatdariyê re jî bû yek ji mijarên sereke. Di vî alî de li dijî teşeyên îfadekirin û têgehên serdest refleks pir pêşketibûn. Tevî kodên ji bo jinan hatine danîn, li dijî têgehên jinan biçûk dixîne, têkoşîn esas bû. Herikbariya vê têkoşînê, dayîmbûn û pratîkbûna wê gelek hat dîtin. Di atolyeyan de zimanê zanista jinan û zanîna jiyanê divê çawa be, hat lêpirsînkirin.

***Çavkanî: Jinnews***

# Koça Sûrê wekî koça welatekî ye

Navenda Nûçeyan

Di ser şerê Sûrê re 6 sal borîn. Têkildarê xirakirina Sûrê şêniyên berê axivîn û anîn ziman ku bi guhertina taxê wekî welatekî biguherin û gotin ku wan gelek bêriya rojên dema Sûrê kirine



Şerê demdirêj ê li Sûrê di navbera 2'yê kanûnê 2015'an û 10'ê 2016'an pêk hat. Di şer de zêdetirî 3 hezar kesan jiyana xwe dest dan. Zêdeyî 22 hezar kes koçber bûn. Piştî şer rayedarên dewletê bi hinceta "Veguhertina bajêr" ji sedî 70'ê xaniyên li Sûrê xera kirin. TOKÎ'yê xaniyên wekî girtîgehê ava kirin.

Di 21'ê adara 2016'an de Lijneya Wezîran di nava 7 hezar û 714 erseyan de ji bo 6 hezar û 292 erseyan biryara "cemaweriya lezgîn" da. Piştre rayedarên TOKÎ 6 taxên navçeyê bi temamî hilweşandin. Di navde dêr, mizgef, koşk, himam û avahiyên dîrokî jî heyî 926 avahî hatin rûxandin. Di ser şerê Sûrê re 6 sal borîn. Beriya salvegara şerê Sûrê em bi şeniyên Sûrê Hanîfe Sencî û Sevîm Sencî re axivîn. Malbata Sencî qala jiyana Sûrê û piştî Sûrê kirin. Malbata Sencî ku gelek zor û zahmetiyên wekî aborî, derûnî û jiyana civakî jiyan, anîn ziman ku bi guhertina taxê wekî welatekî biguherin û wan bêriya Sûrê kiriye.

**6 malbat dê çawa di odeyekê de bijîn**

Şêniya taxa Alîpaşa Hanîfe Sencî ya 66 salî anî ziman ku xaniyê wan 410 metreqare bû, lê yê ku TOKÎ çêkiriye wekî qulikekê ye û wiha got: "Dixwazin em biçin têkevin wê qulikê. Xaniyê ku didin me 250 metreqare ye. Dibêjin 'me pişk avetiye. Ji were ev der derketiye'. Xaniyên wekî Otelên Bûtîk ava dikin. Ji bo xaniyê me 160 hezar tl xistine bankayê. Me qebûl nekir . Ew pere di bankayê de bû 380 hezar tl. Xaniyê ku didin me 500 hezar tl ye. Em şeş malbat in çawa di 3 odeyan de bijîn. Wê kî biçe û kî neçe ?

**Av û ceyran ji ser wan qut kirin**

Şêniya Taxa Alîpaşa ya Sûrê Sevîm Sencî ya 54 salî jî qala derketina ji Sûrê kir û wiha got: "Ez ji dayik bûme heta 5 sal berê li taxa Alî Paşa jiyam. Piştî şer rayedaran xwastin em ji Sûrê derkevin. 2 mehan av û ceyrana me qut kirin. Gotin 'Eger hûn ji xaniyên xwe dernekevin em ê bi serê we de xira bikin'. Em neçar man derketin. 10 sal in veguhertina bajêr didome. Beriya şer digotin 'Ên ku dixwazin dê ji xaniyên xwe derkevin, ên ku nexwaze jî, dernakevin.' Lê şerê Sûrê ji xwe re kirin hincet. Ji me re gotin 'Ji xaniyên xwe derkevin. Me pereyê we xistiye bankayê'."

**Sûr warê jiyanê bû**

Sencî bal kişand ser debara di navbera jiyana li Sûr û semta Vilayetê û wiha axivî: "Dema em li Sûrê bûn xanî yê me bû. Heqê av û ceyranê pir kêm bû. Piştî koçberiyê, em ketin xaniyê kirê. Li vir kiraya me hezar tl ye. Kîraya malbatên din hezar û 400 tl ye. Par me mehane 800 tl heqê xazê dida. Îsal dê zêdetir bibe. Li Sûrê em 6 malbat di xaniyekî de dijiyan. Xanî bi sobe bûn. Piştî şer em belav bûn. Her malbatek ket xaniyekî kirê. Em her roj li sibê difikirin. Îro em ê çi bixwin ? Li Sûrê pere ji bo me bêqimet bû. Sûr ji bo me bereket bû."

Dayika 7 zarokan Sevîm Sencî, bal kişand ser jiyana civakî ya li Sûrê û ev tişt anî ziman: "Em 6 mal di hewşekê de bûn. Me mirişk û kîvroşk xwedî dikir. Xwarin û lêçûna me yek bû. Malzemeyên xwarinê mehakê têra me 6 malbatan dikir. Lê niha tenekeyek rûn têra malbatekî nake. Li Sûrê haya me ji hev hebû. Dema tiştek kêm bûya, me ji cîranên xwe dixwast. Mevanê me dihatin mala me, xwarin tune bûna me ji cîranên xwe dixwest. 5 sal in li vir dijîm. Lê min du cîran nas kirin. Tenê em silavê didin hev. Li Sûrê me tevan hev nas dikir. Me zanîbû kî, kî ye. Me xwe di ewlehiyê de hîs dikir? Me li Sûrê nexwaşî û şahiyên xwe jî parve dikir. Gava ku yek nexweş diket cîran peşiya malbatên wan, ew dibirin nexweşxanê û wan derman dikirin. Diya min li xaniyê nû rehmet kir. Lê haya kesekî jê çenebû. Ku li Alî Paşa bûya, me û cîranan dê bi hev re şîn daniya. Em li Sûrê ji derdê hev re dibûn derman. Em li Sûrê derûnînasên hev bûn. Me derdê xwe ji hev re digot û em aram dibûn."

Sencî qala girîngiya jiyana hevpar jî kir û wiha pêde çû: "Min 7 zarokên xwe di odeyekê de mezin kir û her kes bû xwedî pîşe. Lê niha keça min a biçûk xwedî ode, mase û compîtur e. Lê ne serkeftî û bi coş e. Dema em bi hev re bûn em bêtir şa bûn."

**'Em bêriya Sûrê dikin'**

Sencî, fikarên xwe yên li ser rewşa Sûrê jî anî ziman û got: "Em niha dîsa biçin Sûrê jî dê jiyana wekî berê tune be. Em nizanin dê kî were wan xaniyan. Li derdoran wan hotel û kafeyan ava dikin. Êdî em nikarin bi rehetî derkevin ber deriyê xwe. Hewş û avahî mina girtîgehê çêkirine. Em nikarin li ser xaniyê xwe ji razên. Em bêriya jiyana li Sûrê dikin.

**'Zarok ji lîstikê qut bûn'**

Sencî herî dawî anî ziman ku zarok, kal û pîr gelek di bin bandora koçberiyê de mane û wiha bi dawî kir: "Di Sûrê de zorakên me heya êvarê bi hev re dilîstin. Tu tirsa me ji aliyê ewlehiyê de tune bû. Lê niha ne pêkane ku di nava wan avahiyan de bilîzin. Em bi tirs û fikar in. Zorak ji lîstikan qut bûn û serê xwe ji telefon û tabletan ranakin. Zarokên me li Sûrê bi zimanê xwe diaxivîn. Lê piştî ku me tax guhert, wekî ku em welatekî biguherînin. Zarokên me êdî ne bi kurdî diaxivin û ne jî weka ewilî bi çoş in. Zaroktiya zorakan xilas kirin. Zarokan mahkûmî malan kirin. Zarokên me li Sûrê bi zorê dihatin malên xwe. Lê niha ji odeyên xwe dernakevin. Ji ber vê yekê tenduristî û derûniya wan xira bûye. Pîra me piştî koçber bû û xanî guhert ji qehran jiyana xwe dest da. Gelek pîr û kal piştî koçber bûn, jiyana xwe ji dest dan."

## Dayik li dijî çekên kîmyewî meşiyan

Nerazîbûna Kurdistaniyan ên li dijî çekên kîmyewî jî zêde dibin. Endamên dayikên aştiyê li navçeya Silopiyayê ya Şirnexê kom bûn û li dijî êrişên bi çekên kîmyewî û komkujiyên ku dewleta tirk dikin meşiyan. Dayikên Aştiyê ji Êlih, Sêrt, Mêrdîn, Nisêbîn, Şirnex û Qoserê tev li meşê bûn û li cihekî nêzî Deriyê Sînor ê Xabûrê dest bi çalakiyê kirin. Di meşê de dirûşmeya "Bimire xiyanet" berz kirin. Li vir li ser navê Dayikên Aştiyê Esmer Çekmez axivî. Çekmez diyar kir ku divê dayik hemû li ber kuştina zarokan rabin û wiha got: "Yên ku qala misilmantiyê dikin gelo van komkujiyan nabînin? Misilmantî gelo ev e? Edalet ev e? Gelo hûn îşkenceya ku li cenazeyên zarokên me tê kirin nabînin? Em Dayikên Aştiyê naxwazin êdî ev şer bidome û zarokên me bêne kuştin." ***ŞIRNEX***

## Dadgehê çalakiya konvedanê sûc dît

Bi îdiaya "Rêvebertiya rêxistinê", "Endamtiya rêxistinê" li Berdevka Demê ya Tevgera Jinên Azad (TJA) Ayşe Gokkan doz hatibû vekirin. Rûniştina biryarê di 20'ê Cotmehê de li 9'emîn Dadgeha Cezayê Giran a Amedê hatibû dîtin. Mafê parastina bi zimanê dayikê yê Ayşe Gokkan hatibû astengkirin. Ji 'endamtiya rêxistinê' 30 sal cezayê girtîgehê li Ayşe hatibû birîn. Dadgehê biryara bi hincet aşkera kir. Dadgehê beşdariya Gokkan a ji bo daxuyaniya der barê çalakiya greva birçîbûnê, gotina "Kurdistan", daxuyaniya şermezarkirina "zagona înfazê û tundiya li ser jinê" hinceta sûc dît. Dadgehê çalakî wekî "bi armanca propagandaya rêxistinê" pênase kir. Dadgehê endamtiya Gokkan a Komeleya Jinê ya Rosayê wekî "îllegal" dît û pankarta "Li dijî tundiya mêr û dewletê rabe û bila çavên te li te bin" sûc dît. Dadgehê tevlêbûna Gokkan a çalakiya "Konê çareseriya demokratîk" a 2011'an de li Nisebînê wekî "Propagandaya rêxistinê" dît û sûc hesiband. Dadgehê dîsa gotinên Gokkan ên li dijî êrişên li ser Efrînê û nepoşmaniya wê sûc dît. ***AMED***

## Parêzeran doza Kobanê birin HSK'ê

Di doza Kobanê de piştî ku Serokê 22'yemîn Dadgeha Cezaya Giran a Enqereyê Bahtiyar Çolak di 4'ê mijdarê de bi biryara HSK ji peywirê hat girtin, ji endamên heyeta dadgehê Yildiray Kaya serokê dadgehê hatiye tayînkirin. Li şûna wî Mûrat Donmez hat peywirdakirin. Piştî guhertina heyeta dadgehê parêzerên dozê xwestin danişîn 2 mehan bê taloqkirin û vedora danişînê ku 2 hefteyan berdewam dike bê guhertin. Ji ber vê redkirinê 3 rojên parêzerên dozê dê heyeta dadgehê şemezar bikin û tev li danişînê nabin. Parêzeran serî li HSK'ê dan û giliya heyetê kirin. Parêzeran binpêkirinên ku li dadgehê tên kirin rêz kirin û xwestin daxwaza wan bê qebûlkirin. ***ENQERE***

## Têkoşîna Şenyaşar 5 meh in didome

Nobeta Edaletê ya malbata Şenyaşarê 250 roj li pey xwe hişt. Emîne Şenyaşyar bi biryar li ber xwe dide. Parêzkar û xizmên parlementerê AKP'ê Îbrahîm Halîl Yildiz, di 14'ê Hezîrana 2018'an de ji malbata Şenyaşarê 3 kes kuştibûn. Piştî vê dayik Emîne Şenyaşyar û tevî kurê xwe Ferît Şenyaşar li ber Edliyeya Rihayê "Nobeta Edaletê" dabûn destpêkirin. Ferîd Şenyaşar, anî ziman ku daxwazên wan pir zelal in û wiha got: "Me got ger Tirkiye dewleteke hiqûqê be, çi hewce be dê bike. Em bi du daxwazan hatin vir. Birayê min Fadil 3 sal û nîv in belesebeb girtiye. Xwe parast, lê ji ber zextên siyasî 37 sal û 9 meh ceza lê hat birîn. Daxwaza me ya duyem jî; vekirina dosyeya têkildarî komkujiya li nexweşxaneyê ye ku bi biryareke veşarî tê parastin. Bavê min û birayê min, li nexweşxaneya dewletê, li ber çavê karmendên saziyeke dewletê hatin kuştin." Dayik Emîne Şenyaşar jî lê hatiye vekirin bibîr xist û got: "Ên zarokên min kuştin bi rihetî digerin. Rayedar dizanin kê komkujî kiriye. Lê ji dêvla ku dest bidin wan, radibin dozê li me vedikin. ***RIHA***

## Keştiya Azadiyê gihişt Napoliyê



Di vê çalakiyê de 40 kesayetên ji Amerîkaya Latîn, Spanya, Fransa, Îtalya û gelek welatên din cihê xwe girtin. Çalakî bi pêşengiya Înîsiyatîfa Azadî ji Ocalan re pêk hat. Keştiya Azadiyê ji bajarê Yewnanistanê Lavrioyê dest pê kir û li Îtalyayê bi dawî bû. Keştî bi posterekî mezin ê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ku li ser "Azadî ji Ocalan re" nivîsandî hat xemilandin. ***NAPOLÎ***

## KON-MED: Tirkiye sûcê şer dike

Hevserokatiya Konfederasyona Civakên Kurdistaniyên li Almanyayê (KON-MED) bi daxuyaniyekê ragihand ku di salvegera 23'yan a komploya navneteweyî de dewletên mêtinger hewl didin komployê nû bikin û got, "Li dijî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan tecrîdeke girankirî ku di dîroka mirovahiyê de kêm caran hatiye dîtin, tê ferzkirin. Bi rêya vê tecrîda li dijî mirovahiyê, hewl didin ku têkiliya kûr a gelê kurd û Rêber Apo ji hev qut bikin. Tecrîda li Îmraliyê êrişa li ser daxwaza jiyana azad a gelan e."

KON-MED'ê anî ziman ku komploya navneteweyî niha li dijî tevahiya Kurdistanê tê kirin û wiha dewam kir: "Dewleta tirk bi çekên kîmyewî bombeyan li qadên gerîla û cihên sivîlan dibarîne û dest bi valakirina gundên başûrê Kurdistanê jî kiriye. Dewleta tirk a dagirker bi hevkariya PDK'ê û piştgiriya hêzên navneteweyî dixwaze encamê bi dest bixe. Tevî dane û delîlên li ser vî sûcê dewleta tirk a dagirker jî OPCW yan jî aktorên din ên navneteweyî heta niha gavek neavêtine."



KON-MED'ê, xwest ji bo bidawîkirina tecrîda li ser Ocalan divê CPT û Konseya Ewropayê tavilê bikevin nava liv û tevgerê û wiha bi dawî kir: "Em bang li hikumeta Federal a Almanyayê, NY, civakên dewletên navneteweyî, OPCW dikin ku bi erka xwe rabe. Em bang li gelê xwe yê li Ewropayê û dostên xwe dikin ku ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo, li dijî dagirkerî û êrişên kîmyewî di 13'ê mijdarê de bi ruhê seferberiyê tev li çalakiya li Strasbourgê bibin." ***STRASBOURG***

QADA TENDURISTIYÊ BÛYE QADA BAZIRGANIYÊ

# Nexweşxane veguherîne tîcaretxaneyê

■ M. Alî Ertaş

*Li Tirkiyeyê piştî hikûmeta AKP'ê hat ser îqtîdarê, polîtîkayên qada tenduristiyê li gorî daxwazên bazirgan û sermayedaran pêş xist. Hejmara nexweşxaneyên taybet zêde kir û nexweşxaneyên dewletê jî kêm kirin. Ji ber qada tenduristiyê kirine qada bazirganiyê, êdî nexweşxane bûne tîcaretxane û nexweş jî bûne wekî muşteriyan. Ev jî dibe sedem ku êdî welatî nikarin sûdê ji xizmeta tenduristiyê bigirin. Dîsa ji ber xizmetkarên tenduristiyê zêde kar dikin, her salê zêdeyî hezar xizmetkarên tenduristiye koçî derveyî welat dikin. Hinek ji wan întîhar dikin û hinek jî îstîfa dikin. Em têkildarî rewşa tenduristiyê û polîtîkayên îqtîdarê yên tenduristiyê bi Endamê Lijneya Navendî yê Yekîtiya Bijîşkên Tirkiyeyê Halîs Yerlikaya re axivîn.*

**Li Tirkiyeyê polîtîkayên hikûmeta AKP'ê yên der barê tenduristiyê de çi ne?**

Li Tirkiyeyê polîtîkayên hikûmetê yên li dijî tenduristiyê wekî qadek aborî û tîcaretê ye. Polîtîkayên tenduristiyê wekî mafekî gel ê tenduristiya baş û xweş nayê dîtin. Divê berî her tiştî fikr û ramanên rayedaran jiyana bi tenduristî be. Jiyana bê nexweşî be. Ji bo vê yekê divê gel di karê baş de bixebite û xwarin û vexwarina gel bi tenduristî be. Divê welatî xwedî xanî be û karibe sûdê ji xizmetên şaredariyê bigire. Divê li hawîrdorek bê şer bijî. Divê gel di nava aramî û aştiyê de bijî. Divê berî her tiştî gel di nava aramî û aştiyê de bijî. Divê gel karibe bi hêsanî li her derê xwe bigîne xizmeta tenduristiyê. Tenduristî bi qalîte û bê pere be. Divê tenduristî ji bo her kesî be û bi zimanê zikmakî û dayikê be.

Dema em li polîtîkayên hikûmeta AKP'ê dinerin, yek jî pêk nayê. Nexweşxaneyan wekî tîcaretxaneyan dibînin. Nexweşan jî wekî muşteriyan dibînin. Qada tenduristiyê bûye qada bazirganiyê. Tê zanîn ku gelek nexweşxaneyên taybet ên dewletê û hikûmeta AKP'ê pêşiya wan vekirine hene. Saziya ewlehiya civakî (SGK) gelek piştgiriyê dide wan. Ji ber vê yekê dema welatî nexweş dikevin li nexweşxaneyên dewletê nikare xwe bigîne xizmeta tenduristiyê. Welatî neçar dimînin ku biçin nexweşxaneyên taybet. Bi vê yekê bêtir pereyan ji bêrîka gel derdixin. Niha qeyrana aborî heye. Bandora qeyranê li ser tenduristiyê dike. Welatî nikarin biçin nexweşxaneyan. Welatiyên xizan û karker êdî nikarin biçin nexweşxaneyan. Divê ev polîtîka bêne guhertin. Divê bê zanîn ku tenduristî mafê sereke ye û berî her tiştî ye.

**Polîtîkaya hikûmetê bandorek çawa li ser xizmetkarên tenduristiyê û welatiyên nexweş dike?**

Polîtîkayên ku nexweşxaneyan wekî tîcaretxane dibînê û nexweşan jî wekî muşteriyan dibîne, dibe sedem ku tenduristiya gel xera bibe. Bandora neyînî li ser xizmetkarên tenduristiyê jî dike. Herî zêde xizmetkarên tenduristiyê bi gel re rû bi rû dimînin. Li nexweşxaneyan wekî berpirsiyarê van polîtîkayan wekî xizmetkarên tenduristiyê tê dîtin. Lê bi rastî berpirsiyarê esasî pergal e. Butçeya ji tenduristiyê re tê veqetandin nayê zêdekirin. Rayedar tiştan pêwist pêk naynin. Her ku diçe bêtir xerab dibe. Nexweşiya Covîd 19 jî bû sedem ku şert û mercên xizmetkarên tenduristiyê bêtir xerab bibin. Bi şewbê re pirsgirêk bêtir derketin pêş. Ev yek bandoreke neyênî li ser nexweşan jî dike.

**Welatî çiqas sûdê ji mafê tenduristiyê digirin? Ji bo sûdê bigirin divê xizmetek çawa bê dayîn?**

Her ku diçe welatî ji mafê tenduristiyê sûdê nagire. Mafê tenduristiya gel her ku diçe bêtir binpê dibe. Hikûmeta AKP'ê di destpêkê de hişmendiyek ava kir ku di her qadê de nebaş be jî di qada tenduristiyê baş e. Di hişê gelek kesan de polîtîkayek wisa ava kir. Lê ev ne rast e. Em xizmetkarên tenduristiyê dibînin ku gel sal bi sal bêtir ji mafê xwe yê xizmeta tenduristiyê dûr dikeve. Dîsa di navbera herêman de jî gelek cûdatî heye. Ew parametreyên ku pîvanên tenduristiyê nîşan didin wekî mirina zarokan û mirina dayikan nîşan dide ku şertên tenduristiyê li herêma me xerab in. Herêma herî xerab herêma me ye. Gel ji qada tenduristiyê nagire. Geşedan nîşan dide ku her diçe gel dê bêtir ji mafê xizmeta tenduristiyê dûr bikeve. Ji bo xizmetek baş a tenduristiyê divê hişmendiya ku nexweşxaneyan wekî bazirganiyê û nexweş wekî muşterî dibîne bê guhertin.Divê qad û pergala tenduristiyê ji nûve bê avakirin. Tê zanîn ku di qada tenduristiyê de guhertinek hatiye çêkirin. Pergala performansê pêş xistine. Di pêlika yekemîn de bijîşktiya malbatê danîne. Divê ji bo fakulteyên tibê bêtir butçe bê veqetandin. Divê berî her tiştî tenduristî wekî mafekî asayî, rewa û sereke bê dîtin û qebûlkirin. Di serî de ji bo tenduristiya civakê û gel xera nebe divê di serî de şertên sereke yên pêwist bêne kirin. Di vê pergalê de divê mafê xizmetkarên tenduristiyê jî bê dayîn. Hem mafê debarê û hem şertên xebatê divê bê başkirin. Divê xizmetkar karibin bi dil û can bixebitin.



Yekîtiya Bijîşkên Tirkiyeyê ji bo balê bikişînin ser pirsgirêkên qada tendurdistiyê û li çareseriyê bigerin, dê di 23'ê mijdarê de li Stenbolê dest bi meşê bikin û ji Kocaelî, Bursa û Eskîşehîrê derbasî Enqereyê bibin

**Hûn dikarin hinekî qala şert û mercên xebatê yên xizmetkarên tenduristiyê bikin?**

Şert û mercên xizmetkarên tenduristiyê pir xerab in. Pêvajoya pandemiyê herî zêde bandorek mezin li ser xizmetkarên tenduristiyê kir. Di têkoşîna li dijî Covîd 19 de xizmetkarên tenduristiyê xwe kirin mertal û li dijî wê têkoşîyan. Bedelên pir mezin dan. Nexweşketin û mirin. Lê şert û mercên xizmetkarên tenduristiyê nebaş in. Bandora krîza aborî jî li ser wan zêde bûye. Hêza wan a stendinê kêm bûye. Xizmetkar 36 saetan bênavber dixebitin. Ji ber stratejiya şerê li dijî coronayê, ên întîhar dikin hene. Ên îstîfa dikin hene. Yên ji nexweşxaneyên dewletê diçin nexweşxaneyên taybet hene. Lê dema diçin nexweşxaneyên taybet jî saetên dirêj dixebitin. Li wir jî li ser wan tundî heye. Gelek ji wan nikarin meaşên xwe bistînin. Niha pirsgirêka herî zêde, xebata zêde ye. Xebatkarên tenduristiyê pir zêde dixebitin. Heqê keda xwe nastînin. Kesên bi KHK'yan ji kar hatine avêtin divê dîsa li karê xwe vegerin. Dîsa gelek xizmetkarên tenduristiyê ku zanîngeh xwendine û niha bê karin divê bên tayînkirin.

**Zahmetî û astengiyên li pêş xizmetkarên tenduristiyê çi ne?**

Xizmetkarên tenduristiyê di şertên gelek giran de kar dikin. Rayedarên nexweşxaneyan ji bo şert û mercên nexweşxaneyê baştir bikin naxebitin. Ji ber ku di pergalê de pirsgirêk heye. Mafê xizmetkarên tenduristiyê yê herî zêde tê binpêkirin, mafê keda wan nayê dayîn û zêde dixebitin. Di şertên giran de bi saetên zêde kar dikin. Nexweşxane ne li gorî şertên pandemiyê ye û bi vî şiklî dixebitin.

**Bi taybetî piştî pandemiyê di şert û mercên bijîşkan de guherînek çawa çêbû. Di vê pêvajoyê de çiqas bijîşkan îstîfa kir. Yên ku îstîfa kirin niha çi dikin?**

Ji ber şertên giran, ji ber tundiya rayedaran, bi gelemperî ji ber siyaseta rayedaran ku li Tirkiyeyê dimeşînin, di nav xizmetkarên tenduristiyê û bijîşkan de bêhêviyek mezin pêş dikeve. Ev jî dibe sedem ku xizmetkarên tenduristiyê pêşeroja xwe li vî welatî nabînin. Li gorî daneyên di destê me de her meh 80 bijîşk serî li Yekîtiya Bijîşkên Tirkiyeyê didin û belgeya tesdîqnameyê ya nîşan dide ku ew bijîşk in, ji me dixwazin. Salê nêzî mezûnên 6 fakulteyên tipê diçin derveyî welat. Yanî nêzî Hezar û 200-300 kes diçin derveyî welat. Dixwazin li wir bijîşkiyê bikin. Pêşeroja xwe li vir nabînin. Ji ber vê yekê diçin derveyî welat. Ji ber van şertan gelek bijîşk îstîfa jî dikin. Yan diçin nexweşxaneyên taybet, yan jî diçin derveyî welat. Bi taybetî pandemiyê şertê bijîşkan xerab kir û barên wan giran kir. Ji bo ku vîrûs li nexweşxaneyan û nava gel belav nebe û bi rengekî din bihata pêşwazîkirin, diviya bû gel jî tev li vê têkoşînê bihata kirin. Divê rayedaran bawerî bidaya gel. Yek ji nebaweriyan jî aşî ye. Herî zêde gel li herêma me baweriya xwe ji aşiyan nîne. Li herêma me rêjeya aşiyê pir kêm e. Ev jî pirsgirêk e. Yanî vê pandemiyê barekî pir giran danî ser pişta xizmetkarên tenduristiyê.

**Odeya Tabîban a Amedê û Yekîtiya Tabîbên Tirkiyeyê ji bo mafê bijîşkan çi dike û divê çi bike?**

Bi rastî jî ji bo em van şert û mercan biguherînin em di nava hewldan û têkoşînek mezin de ne. Beriya pandemiyê jî û di pêvajoya pandemiyê de jî me her tim pirsgirêk dianîn ziman. Me hem pirsgirêk û hem jî rêyên çareseriya wan jî anîn ziman. Ji bo pergalek nû ya xizmeta tenduristiyê bê avakirin û her kes karibe ji mafê gel ê tenduristiyê neyê binpêkirin, ji bo tedawiyek baştir û bi leztir, ji bo gel bi hêsanî û bêpere xwe bigîne nexweşxaneyan, me gelek pêşniyar kirin. Lê heta niha mixabin rayedarên ku Tirkiye bi rêve dibin, ne li gorî zanistiyê û ne li gorî fikra tenduristiya gel tev geriyan. Bêtir li gorî berjewendiyên xwe tev digerin. Ev jî dibe sedem ku di siberojê de bêtir pirsgirêkên qada tenduristiyê zêde bibin. Divê gel ji bo karibe xwe bi hêsanî bigîne mafê tenduristiya baş li mafê xwe yê tenduristiyê xwedî derkeve. Em jî wekî Yekîtiya Bijîşkên Tirkiyeyê wekî Odeya Bijîşkên Amedê, di nava xebat û têkoşînê de ne. Heta niha em her hefte daxuyaniyan didin. Em ê di 23'ê mijdarê de li Stenbolê meşekê li dar bixin. Meş dê ji Stenbolê dest pê bike, li Koçaelî, Bursa, Eskîşehîr û piştî wê di 27'ê mehê de em ê li Enqereyê bin. Me navê wê Meşa Spî bi nav kiriye. Em ê li Enqereyê forumlekê li dar bixin û em ê van pirsgirêkan niqaş bikin. Heta niha me bi partiyên siyasî yên li parlamento û ne li parlamentoyê jî ev niqaş kirine. Têkoşîna me ya ji bo tenduristiya gel didome.



## Halis Yerlîkaya kî ye?

Uzm. Dr. Halis Yerlîkaya di sala 1980'yan de li Amedê hatiye dunyayê. Di sala 2004'an de ji Fakulteya Tipê ya Zanîngeha Enqereyê mezun bûye. Doktorê pispor Halis Yerlîkaya niha li Nexweşxaneya Lêkolîn û Perwerdehiyê ya Gazî Yaşargîl a Amedê dixebite . Ew Pisporê Nexweşiyên Navdil û Onkolojiya Tibî ye. Her wiha Halîs Yerlîkaya wekî endam cihê xwe di nava Konseya Navendî ya Yekîtiya Bijîşkên Tirkiyeyê de digire.

# Di perwerdê de sedem û şopên şîdetê



Amed Tîgrîs

Li malbatên nezan, civatên paşvemayî û li dibistanên teokratîk şîdet (kotekî/tundî) ciyekî berfireh digire û roleke girîng dilîze. Şîdet bi tenê ne fizîkî ye, çendik û çend cureyên şîdetê hene. Ji wan çendên sereke ev in:

Şîdeta fizîkî, şîdeta psîkolojîk, şîdeta aborî, şîdeta hestyarî û havildarî.

Ez dixwazim di vê nivîsê de cureyên şîdetî bi çend hevokan vebêjim.

Şîdeta fizîkî, lêdan, îşkence, tade û çalakiyên hişk in. Ji bo wê jî şîdeta herî dijwar, tund û xerab e. Ev cureyê şîdetê wiha dirinde ye ku di dema me de, li gelek welat û civatan hatiye qedexekirin. UNICEF jî şîdeta li ser zarokan bi tundî qedexe kiriye û dixwaze zarokên ku şîdet dîtibin bigirin bin sîwana parastinê. Mixabin hîn îro jî li mal ji aliyê dêûbav û li dibistanê ji aliyê mamoste û personelên dibistanê ve zarok rastî şîdeta fizîkî tên. Hinek dêûbavan wiha bawer kirine ku bi lêdanê zarok bi aqil dibin û terbiyê digirin. Dema min li gundê Cinezûra Licê dest bi mamostetiyê kir, çend caran dê û bavên zarokan hatin dibistanê û giliyê zarokên xwe li min kirin: "Mamosteyên beriya te li zarokan dixist, zarok ditirsiyan û di hedê xwe de bûn. Îsal tu hatî, tu li zarokan naxî, zarok har û hêç bûne û bi gotina me nakin..." Rojekê zilamek jî hat got "lawê min tembel e. Heta ji destê te tê lêde. Her çoyek dermanê aqil e. Destê lêdan bila ter û şîn be!" tirk jî dibêjin, "lêde, goşt ji te re û hestî ji min re."

Her wiha li nav civat, cihê kar û kolanan jî zarok rastî şîdeta rojane tên, birçî û tazî dimînin. Zarok ji aliyê fizîkî û ruhî ve birîndar in. Birîndarên bêdeng in. Carnan ew nikarin dengê "ax" û "of" jî derînin. Du sedemên bêdengiyê hene. Yek zarok ji tirsan deng nake û her tiştî diavêje hundirê xwe. Ya duyem dêûbav, mamoste û derûdor naxwazin zarok derdê xwe bi awayekî aşkera vebêje.

Zarokên ku di biçûktiya xwe de şîdetê dibînin, dema mezin dibin, nikarin bi hêsanî bi civatê re biguncin. Beşeke mezin di jiyanê de dibin xwedî kelem, asteng û problemên civakî. Li gorî encama lêkolînan, zarokên ku şîdet dibînin dema mezin dibin, ew jî di navbera ji sedî 30 û 60'î de şîdetê bi kar tînin. Civat dibe wekî ar û barûdê û diteqe. Loma li cografya Rojhilata Navîn şîdet wek mêranî û qehremanî tê binavkirin. Ji ber sedemeke biçûk, ne biyanî mêr û jin, bav û law, xwişk û bira hevdu perîşan û riswa dikin. Hewl didin ku problemên xwe yên herî biçûk bi şîdetê çareser bikin. Civat heta ber dev bi şîdetê dagirtiye. Şîdet mêranî ye, pîroz e û çareseriya dadmendî ye. Di gelek stranên kurdî de dîsdorek (neqeratek) wiha heye: "Heyfa min nayê li kuştina mêran û şêran, heyfa min tê ku ji milî egîdê mala bavê min stendinê wê mîrata modoliyê." Dîtin û felsefeyeke ecêb e! Heyf li kuştinê nayê, li eşya, mal, milk û navûdeng tê.

Şîdeta psîkolojîk, şîdeta fizîkî demdemî ye, dikare ji demekê şûn ve pêşî lê were girtin; lê şîdeta psîkolojîk mayînde ye, temendirêj û berfireh e. Hemû cure û rengê şîdetê digire nav xwe. Şîdeta havilî, hestiyarî, aborî, sersarî û tehdit di nav de hene. Di şîdeta psîkolojîk de biçûkdîtin, tirsandin, tecrîtkirin, stres, depresyon, panîk û endişe hene. Şexis xwe sûcdar dibîne, bêbawer e. Şîdeta psîkolojîk di jiyana mirov de birînên kûr û sotî dihêlin. Şopa şîdeta psîkolojîk 40-50 sal dikare dom bike. Di kurdî de gotina ku "birîna devê şûr zû rehet dibe, lê birîna gotina çors heta mirinê rehet nabe" tam ji bo vê mijarê ye. Ev gotin ji pirtûkeke psîkolojîk a hezar rûpelî hêjatir e.



Şîdeta hestyarî û havildarî (emosyonel/hîsî), zarok ditirsînin, heqaret lê dikin, mobîng dikin, dêûbav zaroka xwe bi hevalên wê re berawird (muqayese) dikin. Wek nimûne: "Ka binêre hevalên te çi qas baş in, bi aqil in, lê tu ji tiştekî re nabî. Ew jêhatîne, lê te daye ser rêya tembeliyê..." Bi gotinên wiha dilê zarok dişkînin, biçûk û kêm dixin. Tim li wî û li karê wî rexne digirin. Zarok kovan û xemgîn dikin. Baweriya zarok dişkînin û bi kurtî her daxwazê zarok red dikin. Mirov nikare şîdeta psîkolojîk a hestyarî û yên din ji hevdu baş cuda bike. Ew her yek weke xelkeyên zincîreke dirêj bi hevdu ve girêdayî ne.

Şîdeta aborî, dêûbav pêdiviyên zarok bi cih nayînin. Mesrefa rojane nadin, li dibistanê dema hevalên wî/wê tişt dikirin ew stûxwar, bendewar û şermezar dimîne. Sê sedemên mijarên aborî hene. Yek, dikare ji feqîriya malbatê be. Du, dikare ji nezaniya dêûbav be. Sê, dikare ji çikûsî û destgirtiya malbatê be. Hinek malbat hene ku di rewşên wiha de hewl û tahn didin ku zarok here kar bike. Ev bi xwe şîdeta havilî ango ya îstîmarî ye. Ev daxwaz û rewş kesayetiya zarok dişikîne, berê wî dide rêya xerab. Berê wî/wê dide tolazî, pêxwasî û diziyê. Dêûbav bi destê xwe mala xwe xerab dikin. Li ber zaroka xwe rêya kar û barê krîmînaliyê ve dikin.

Şîdeta sersarî, dêûbav sersarî yan xemsarî dikin. Li zaroka xwe xwedî dernakevin, jê re hevaltî û alîkariyê nakin. Zarok dikare ji rê derbikeve û bibe krîmînal. Bi lêkolînên zanistî hatiye tespîtkirin ku kesên guhên wan li ser zarokên wan bin, bi zarokên xwe re eleqedar bin, bi wan re dipeyivin, sohbet bikin, pêdiviyên (îhtîyacên) wan bi cih bînin, zarokên wan malbatan ji aliyê zanîn, perwerde, karakter, terbiye û tore ve gelek zîrek û serwext dibin. Zarokên ku dêûbav bi wan re eleqeder nebin, berpirsyarî û erka dêûbavtiyê bi cih neyînin, wan bi serê xwe û bêxwedî bihêlin, kotekiyê lê bikin ew zarok nezan, bêtore û beredayî dibin.

Li gorî Dêzgeha Îstatîstîkan a Tirkiyeyê (TUÎK) ya sala 2019'an li Tirkiyeyê, zarok herî zêde ji ber sûcê îstîsmara birîndarî û zayendî (cînsî) stembar û sûcdar bûne. 206.498 zarok ji sedî 57,6 birîndar, ji sedî 15,2 îstîsmara zayendî û ji sedî 11 jî li dijî dezgeha malbatî dûçarî sûc bûne. Ev felaketeke pir mezin e.

Di sala 1958'an de, li zanîngeha King's College di vî warî de, li ser 7.771 zarokan lêkolîneke hatiye kirin. Zarokên ku di biçûktiya xwe de şîdet dîtine bi taybetî şîdeta psîkolojîk dîtine, dema ew mezin bûne ji aliyê tenduristî, hunerî, şiyanî (qebîlyet), kardîtin û karkirinê ve rast û tûşî problemên dijwar hatine. ewqas sal di ser zaroktiya wan de derbas bûne jî hîn xwe ji bin banora wê psîkolojiya dema zaroktiyê rizgar nekirine.

Zarokên ku tûş û dûçarên şîdetê dibin, di jiyana wan de ev cure nexweşî û kêmasî dikarin werin serê wan: Fikar, veciniqîn, tirs, xewnekirin, mîstina şevê, kabûsdîtin, serêş û zikêşî, bêdengbûn, êrîşkarî, bi xwe nebawer, bi hevalên xwe re bi hevdu nekirin, bêexlaqbûn, piltî û lalîtî, di dersê de serneketin, neçûn û reva ji dibistanê, pirsgirêkên konsantrebûnê, hizir û hewldana xwekuştinê...

Sedemên peydabûna şîdetî gelek in. Ev jî li gorî asta perwerde, aborî û çanda civakan tê guhertin. Sedemên ku heta niha bi awayekî zanistî hatine tespîtkirin, mirov dikare wiha bi rêz bike:

Nezanî, xizanî, bêkarî, bêmalî û jiyana bêserûberî, hilbijartina hevalên ne baş, malbatên mezin û zêdebûna hejmara zarokan, şer û şîdeta dêûbavan, sêwîtî û bêxwedîbûn, stres û îzalasyona civakî...

Belê, ez dikarim bi kurdî û kurtî bibêjim; kotekî zanistiyê, mirovahî û azadiyê ji holê radike û zordarî, koletî û dirindetiyê (wahşetê) tîne.



Îbrahîm Seydo Aydogan

# Têkiliya hiş û zimên

Peydabûn, pêşketin, erk û fonksiyona çalakiyên zimanî ji destpêkê ve bûye mijara lêkolînan û bala filozofan û fikirdaran kişandiye. Arîsto digot armanca ziman ew e ku tiştekî yan fikrekê bi zelalî rave bike. Di vê çalakiyê de, derbirîna tiştên nava hişî esas e. Jixwe heta ku fikir di nava hişî de bimîne û dernekeve derve, nikare çalak jî bibe. Çalakiya yekem a fikrê, derbirîna wê ye. A ku divê bala me bikişîne, gelo mirov kîjan zimanî bi kar tîne û wî zimanî jî çawa bi kar tîne.

Pirsgirêka zimanî ew e ku di rêya derbirîna ramana hişî de gelo şiyana wî çendî derfetê dide ku wê ramana hişî weke xwe bide; gelo çiqasî sadiqî ramana resen a jêderkê ye. Lewre, herçî raman e, di hişê mirov de bi peyvan û bi hevokan ava nabe. Raman di nava hişî de ne weke wêneyan e jî; şiklê ramanê nîn e, peyvên wê jî nîn in, lê raman weke alaveke nexuyayî heye. Bi tenê gava ku mirov dixwaze wê ramanê rave bike, hingê hê nû şiklek jê re ava dibe.

Heger rewş ev be, gelo mirov çawa dikare bibêje ku ziman, di pêvajoya derbirînê de, wê ramanê naguherîne? Ji ber wê ye ku divê mirov bibêje ziman bi temamî nikare ramanê rave bike lê ziman baştirîn rê ye ku di destê mirov de ji bo derbirîna ramanê tê bikaranîn. Yanî, ziman bi tenê hewldanek e, hewldaneke neçar e û hêza wî jî ne gelekî zêde ye. Divê neyê jibîrkirin: Çalakiya derbirîna hişî, ne bi tenê axavtin an bikaranîna peyvan e. Heger wiha bûya, diviya me bigota zimanê lawiran tuneye. Lê, hê di nîvê sedsala 19'an de, lêkolîneran destnîşan kiriye ku zimanekî mozan jî heye. Zimannasan dîtiye ku moz bi vîzevîza xwe û bi şiklê firîna xwe ve cihê xwarinê ji hevdu re dibêjin.

Hingê, her tişt ziman e. Pisporên analîst, êdî bawer dikin ku ziman li gorî stratejiyên mirovî dikare biguhere. Herçî raman e ku dibe peyama axêvêr, divê bi rêyine din ve jî were wergirtin. Her tevgera me xwedan wateyekê ye, her niherîna me, hêrs û xem û tirs û şiklên rûyê me, hemû jî şikleki psîkolojîk in ku hişê me nîşan didin. Zimanê axavtinê, xwe bi tevger û jestan jî xurtir dike, da ku bikare peyama xwe ragihîne kesên hember. Lewre, peyv bi tena serê xwe têra derbirîna ramana hişî nake. Ji bo vê jî qodinan bi kar tîne ku ji aliyê kesên hemberî wî jî dikarin bêne fahmkirin. Yanî, ziman lihevkirinek e, peymaneke civakî ye û ji bo bersiva wê pêdiviya mirovî peyda bûye. Pêdiviya axavtinê û derbirîna ramana hişê xwe, derbirîna helwesta xwe ya li ser tiştên jiyanê.

Her ziman li ser sîstemeke cuda hatiye avakirin ku serboriya her peyva zimanî jî li gorî xwe hêja ye ku mirov bala xwe bidiyê. Ziman tişta dîtî bi nav dike, lê di vê binavkirinê de ya diyarker hişmendiya axêveran e. Pênaseya civakî ya ji bo her rewşa nû, bi vî awayî dikeve nava zimên jî.

Axêverên zimanekî, gava ku tiştekî yan rewşeke nû dibînin, bi awayekî xwezayî navekî li cem xwe lê dikin. Ev binavkirin li gorî perwerdehiya civakî û li gorî peyvên heyî yên nêzîkî wê rewşê ne ku hemû jî helwesta civakî nîşan didin. Hingê, ziman li ser hişmendiya civakî hatiye avakirin. Ji ber wê ye ku gava ku mirov li ser binavkirinên zimanî bixebite, mirov dikare tavilê nas bike ka gelo axêverên wê civakê li ser filan an bêvan mijarê xwedan çi helwestê ne. Her mirov, her civak şopa hişmendiya xwe li ser zimanî dihêle. Peyvek, qalibek, biwêjek, metaforek hingê dibe şopa ku mirovan li pey xwe hiştiye. Heger rewş ev be, gava ku mirov li ser zimanê civakekê lêkolînan bike, mirov dikare dîroka zimanê wî, dîroka guherînên jiyan û hişmendiya wî jî bibîne.

Lêkolînên li ser zimanê aborjînên Awustralyayê nîşan daye ku hin zimanên van niştecihên Awustralyayê derdora 300 peyvan tenê nas dikin. Di jiyana wan de, bajar tuneye, bazirganiyeke arkaîk heye, çalakiyên wan yên jiyanî li ser peydakirina xwarinê ye.

Li ser zimanan gelek efsane hene ku di nava xelkê de digerin. Behsa zimanê dewlemend û zimanê qels tên kirin. Lê zimanê qels û zimanê dewlemend tuneye. Axêverên wî zimanî çi bijîn zimanê wan jî li gorî wê pêş dikeve. Ziman dikarin bandorê li hevdu bikin, peyvên xwe biguherin, li gorî rewşên nû, baweriyên nû yan îdeolojiyan, ziman jî xwe adapte dike û diguhere.

Li gorî têkiliyên zimanan an cudahî û şibandinên nava wan, zimannasan ziman di nava malbatên cuda de dabeş kirine, lê ev fikra malbatên zimanan, bi tenê li ser wê hîpotezê hatiye avakirin ku ew koma zimanan ji heman bingehî tên. Zimannasan îro nîşan daye ku ew ne fikreke gelekî maqûl û qaneker e.

Ziman di nava hev de û bi hev re dijîn. Her civat jî zimanê xwe her diguherîne, adapteyî jiyana xwe û têkiliyên xwe û helwest û bîr û baweriyên xwe dike. Ji ber wê ye ku van sîh salên dawîn peyvên mîna "rojbaş, şevbaş, dembaş" ji bo silavan tên bikaranîn ku di metnên kevn de şopa wan tuneye, lê berhemên jiyana modern in û her wiha şopên helwesteke îdeolojîk jî vedihewînin.

Lê, ziman her çendî dijîn û diguherin, her wiha dimirin jî. Bi rewşên dema modern, bi penaberiyê, bi koçberiyê, bi şeran, bi dagîrkirin û asîmîlasyonê jiyana mirovahiyê her wiha dîtiye ku gelek ziman ji holê rabûne..

Niha li ser rûyê cîhanê nêzî 6.500 ziman hene. Hin ji van zimanan, tenê ji aliyê çend sed kesan ve têne axavtin, weke hin zimanên aborjînên awustralyayî, lê hin ziman jî mîna ingilîzî û fransî û erebî yan spanyolî li cîhanê belav bûne. Bazirganî, kolonîzasyon û dîplomasî û carna jî bawermendî û oldarî peywendiyên van zimanan ava dikin. Heta dawiya sedsala 21'ê, zimannas bawer dikin ku piraniya van zimanan dê wenda bibin, mîna bi hezaran zimanên ku îro kes bi wan napeyive, mîna latînî ku zimanê rewşenbîrî û filozofiyê bû, lê îro zimanekî mirî ye, mîna sansikrîtî û pehlewî ku zimanên mezin yên desthilatdariyan bûn, lê îro zimanên mirî ne. Mirovahiyê, gelek tişt ava kirin, lê gelek tişt kuştin jî. Mirina zimanan hingê wendabûna parçeyekî bîra mirovahiyê ye. Civaka ku zimanê xwe ji bîr dike jî hingê dibe civakeke bêbîr, bêdîrok, bêçand, û bêjiyan; lewre hemû jiyana wî di nava zimanê wî de ye.



Xweşkanî

Felemez Ulug

# Trajediya koçberên kurd!

Pirsgirêka koçberan a li ber deriyê Yekitiya Ewropayê, bêyî jê re çareseriyek bê dîtin didome. Bi hezaran koçber bi hêviya ku derbasî Polonyayê bibin, li ser sînorê vî welatî ji aliyê eskeran ve hatine sekinandin.

Esker ji bo pêşî li derbasbûna wan bigirin gelek caran darê zorê bi kar tînin. Koçberên ku piraniya wan ji kurdên başûrê Kurdistanê ne, li daristanên ku dişibin kampên ser vekirî dimînin. Di vê demsala sar de jin, zarok û temenmezin zehmetiyên pir giran dijîn. Koçberên bêçare hatine hiştin li benda alîkariyê ne. Saziyên alîkariyê tevî hemû astengiyan kêm be jî hewl didin alîkariyê bigihînin koçberan. Tevî alîkariyên kêm jî zehmetiyên ku koçber dijîn pir in.

Di vê rêwîtiya bi êş de haya niha herî kêm 3 kesên ji Başûr ji ber serma û birçîbûnê jiyana xwe ji dest dane. Artêşa Polonyayê jî 7 cenaze li rex sînor dîtin.

Li ser vê êşa koçberan rêvebiriya Polonya û Belarûsyayê hev sûcdar dikin. Di vê krîzê de herî zêde jî li ser rola Tirkiyeyê tê sekinandin. Ji ber ku sicîla Tirkiyeyê di mijara koçberan de paqij nîne, saziyên navneteweyî balê dikişînin ser pêkanînên Tirkiyeyê, bi taybet jî qaçaxçîtiya mirovan. Komên qaçaxçî yên li Tirkiyeyê hatine avakirin rojane bi dehan mirovan bi hêviyên xapînok ber bi sînorê Ewropayê ve rê dikin. Ev torên bazirganiya mirovan her roj kom bi kom mirovan ber bi tarîtiyê ve bi rê dikin.

Li gorî ajansên navneteweyî di veguhestîna mirovan de Tirkiye, Qeter, Belarûsya û rêvebiriya PDK'ê xwedî rol in. Bi taybet konsolxaneya Belarûsya ya Bexdayê ji ber dayîna vîzeyan tên tewanbarkirin. Dewleta tirk û Qeter jî bi rêya şîrketên xwe yên balafiran di nav vê tora qirêj de ne.

Di vê mijarê de rojnameya Bildê ya almanî bi analîzekî bal kişandibû ser rola Tirkiyêyê ya di vê trejediyê de. Rojname radigihîne ku dewleta tirk, Qatar û Rûsya ji balafirgehên Moskow, Stenbol, Antalya, Hewlêr û Şamê kurdan dibin paytexta Belarûsyayê ya Mînskê.



Der barê mijara li ser têkiliyên navbera Tirkiye û rêvebiriya PDK'ê de jî tê sekinandin. Piraniya koçberan ji ber zextên PDK'ê reviyane. Bi van zextan ve girêdayî bêîstiqrarî, bêedalatî û xizaniya li herêmê wek sedem tên nîşandin. Gelek derdor rewşa koçberan dişibînin pêvajoya salên 90'î. Çawa xelkê başûrê Kurdistanê di sala 1991'î de ji ber zilma rejîma Baasê reviyan, niha jî ji ber pêkanînên PDK'ê koç dikin. Lê tevî vê trajediya ku li ber çavên cîhanê rû dide, PDK hîn jî ker û lal e.

Nûnerê Hikûmeta Herêma Federal a Kurdistanê yê li Polonyayê Ziyad Raûf li ser mijarê ji Dengê Amarîkayê re axivî û têkildarî vê trajediya heyî agahiyên balkêş parve kirin. Li gorî agahiyên Raûf dayî penaberên derbasî Polonyayê bûne di îfadeya xwe de dibêjin, "Ez rojnameger im. Heger li Kurdistanê bimînim, dê min bigirin, îşkenceyê li min bikin." Hin ji wan ciwanan jî gotiye, "PDK dixwaze bi zorê me bişîne şerê li dijî PKK'ê."

Bêguman ev lixwemikurhatin ne tiştekî ji rêzê ye. Ev di heman demê de hevkariya dewleta tirk a bi rêvebiriya PDK'ê re jî radixe ber çavan. Lewma di koçberkirina van kesan de û tradejiya ku li ser sînorê Polonya û Belarûsê tê jiyîn, rola PDK'ê jî ne kêm e.

# Parrhesîa: Ev der Kurdistan e



Hisên Çatikkaş

"Zimanê me tê înkarkirin. Nasnameya me tê înkarkirin. Kurdistan tê înkarkirin. Em li hemberî vê yekê ne, em hene... Ev der a ku tu niha lê yî, Kurdistan e. Lê mixabin ev Kurdistan li meclisê tê înkarkirin."

Bêguman kesên vê nivîsê bixwînin dê xwediyê van hevokên li jor binasin. Ji ber ku ew rastgoyekî wisa bû ku li nava çavên dagirker meyzand û heqîqet bi lêv kir. Kesên derdê wan heqîqet be dê nikaribin van gotinan paşguh bikin.

Her çiqas dagirkerên li ser xaka Kurdistanê, Kurdistanê înkar bikin jî rastgoyekî wekî Cemîlî di carekê de derket û di demeke teng de rojeva welat guherî. Heqîqeta Kurdistanê weke şimaqekê li nav rûyê dagirkerên welatê xwe da.

Axaftina Cemîlî ya li hemberî Meral Akşenerê yekser pirtûka Micheal Foucault anî bîra min ku navê pirtûkê Parrhesîa ye. Di eslên xwe de Foucault bi xwe ev pirtûk nenivîsandiye. Lê dema li ser têgeha 'Parrhesîa' ders daye ji aliyê xwendekarên wî ve nîşe hatine girtin. Piştî mirina wî ev nîşeyên dersê jî weke pirtûk hatiye çapkirin.

Dîroka têgeha Parrhesîayê xwe digihîne Yewnana kevnare. Lewma Foucault jî di dersên xwe de bi berfirehî li ser vê têgehê sekiniye. Parrhesîa bi îngilizî "free speech" (axaftina azad) û bi almanî jî freimütigkeit (rastgoyî/wêrbêjî) hatiye wergerandin. Parrhesîastes (Rastgo/wêrbêj) jî ji kesê/a heqîqetê dibêje re tê gotin. Parrhesîastes ew kes e ku tiştên di dil û hişê xwe de bi awayekî aşkera û zelal ji kesên li hemberî xwe re dibêje, bêyî ku tirs û gumanê ji gotinên xwe bike vedibêje. Ewqas aşkera û zelal dibêje ku kesên li pêşberê wî/ê axaftinên wî/ê baş têdigihin. Helbet wêrbêj ango Parrhesîastes bi awayekî vekirî diyar dike ku ev fikr û ramanên wî/ê ne ku di bin bandora keseke/î din de nemaye. Lewma Axaftinên xwe venaşêre ango rasterast dibêje. Parrhesîastes bi axaftinên xwe bawer e, lewma jî ya di hiş û dilê xwe de bi kesên li hemberî xwe dide fêmkirin.

Lê ya girîng ew e ku di navbera axaftvan û guhdarvan de statuyeke cuda hebe ango statuya guhdarvan ji ya axaftvan bilindtir be. Ji bo ku divê rîskeke gotinên axaftvan ji bo wê/î hebe. Heke Parrhesîastes ango axaftvan vê yekê bike nirxê gotinên wî/ê bilindtir û mezintir dibe ku ew wê demê dibe rastgo. Lewma Foucault dibêje cihê Parrhesîastes agora ye ku agora li Yewnana kevin meydanên demokrasiyê ne. Helbet niha agora nînin lê li şûna wan kamera hene ku Cemîlî li hemberî dagirker û kamerayên wan rastî ango heqîqet vegot. Lewma jî dagirkeran xwestin wî li hemberî kamerayan çavtirsandî bikin. Saet di 3'yê şevê de bi ser mala Cemîlî de girtin û ew binçav kirin. Du helwest li vir derketin ku yek a dagirkeran bû, bi vê helwesta xwe dixwestin di şexsê Cemîlî de kurdan bitirsînin da ku careke din heqîqet neyê ziman. Helwesta din jî ya Cemîlî bû ku di qerekolê de û piştî hat berdan jî bi heman awayî heqîqet bi lêv kir û got: "Bijî Kurdistan." Ma vêca heqîqet tê tunekirin?

Li gorî vê analîza Foucault, çalakiya Cemîlî parrhesîa ye û ew bi xwe jî Parrhesîastes e. Ji ber ku Cemîlî ya di dil û hişê xwe de (di eslê xwe de ya di dil û hişê piranî kurdan de) bi awayekî pir sade û aşkera bi nav kir û anî ser ziman. Statuya Akşenerê ji ya Cemîlî bilindtir bû ku ew weke nûnera dewleta dagirker li hemberî Cemîlî bû. Gotinên Cemîlî ji bo wî xetere û rîskeke mezin çêkir ku roja din ew binçav kirin û birin qerekola dewletê. Helbet Cemîl li vir jî ji gotinên xwe nehat xwarê û heman gotin bi heman awayî dubare kir. Paşdegavneavêtina Cemîlî û helbet çalakiya wî helwesteke rast bû. Lewma ji gelek aliyên cuda piştgirî girt.

Demeke dirêj e, xwediyên van partiyên nû ava bûne li Kurdistanê digerin û dixwazin xwe li ber dilê kurdan şêrîn bikin. Bi çend gotinên li ser mafê ziman û nasnameya kurdan ketina pey nêçîra dengên kurdan. Yek ji wan jî Davutoglu ye ku di serdema serokwezîriya wî de gelek bajarên kurdan hatin xirakirin, bi sedan kurd hatin kuştin. Lê bawer im, piştî gotinên Cemîlî dê dagirker weke berê li Kurdistanê bi dilekî rehet nikaribin bigerin û her dikana bê pêşiya wan dê nikaribin têkevinê. Ji ber ku Cemîlî rastî û heqîqet bi awayekî pir zelal û delal anî ziman. Rastiya ku Cemîlî bi lêv kir, rastiya di dilê her kurdekî/ê de ye. Lewra gotinên Cemîlî ewqas deng vedan û bala hemû kurdan kişand ser xwe. Lewra gelek kesên xwediyên ramanên cuda jî piştgirî dan Cemîlî û li cem wî cih girtin. Rastî/heqîqet beloq e. Her çiqas dagirker rastiyan tune bihesibînin jî dê her carê di nav rûyê dagirker de biteqe. Dagirker ne li hêviya rastgoyekî wekî Cemîlî bû, serobino bû û nikaribû tiştekî li ser rastiyan bibêje.



Piştî Akşener vegeriya welatê xwe êrîşî HDP'ê û kurdan kir lê êdî em bi dilekî rihet dikarin bibêjin ku înkarkirin li hemberî heqîqetê têk çû. Akademîsyen Hifzûllah Kûtûm jî ji ber gotina 'Bijî Kurdistan' hat girtin û piştre hat berdan.

# Dê li dijî Belarûsê dane berfireh bibin



Seroka Komîsyona Ewropa Ursula Von Der Leyen piştî li Qesra Spî bi serokê DYA'yê Joe Biden re civiya diyar kir ku dê Yekitiya Ewropayê daneyên li dijî Belarûsê berfireh bike. Von der Leyen da zanîn ku toleyên nû dê dijî kesan û saziyan werin ragihandin.

Seroka Komisyonê di axaftina xwe de bal kişand ser rewşa koçberên li sînorê Belarûs û Polonyayê û diyar kir ku ew rewşa li wir ne 'kêşeya koçberan' e, lê encama hewildana ''rejîma otorîter'' ya Mînskê ye ku dixwaze cîranên xwe ''bêîstiqrar'' bike.

Têkildarî aloziya penaberan a li ser sînorên di navbera Belarûsya-Polonyayê de serokê Partiya Gel a Ewropayê Manfred Weber got, divê destûr neyê dayîn ku şîrketên rêwiyan ên hewayî yên Tirkiyê balafirgehên welatên Yekitiya Ewropayê bi kar bînin.

Manfred Weber di semînerekê de li Parlamentoya Ewropayê (YE) ya li Brukselê, têkildarî aloziya domdar a penaberan a li ser sînorên Belarûsya-Polonyayê got: "Divê em erkên şîrketên rêwiyan ên hewayî ji bîr nekin. Heke kesek bixwaze pere li YE'yê qezenc bike mîna şîrketên Tirkiyeyê, divê fêm bike ku nikare bi rêya bazirganiya mirovan tev li vê yekê bibe." ***BRUKSEL***

# Dê yekitiya gelan dagirkeriyê têk bibe

Navenda Nûçeyan

**Têkildarî êrîşa dewleta tirk a di 9'ê mijdarê de nivîskar Mustefa Ebdo axivî û diyar kir ku vîn û berxwedana gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ji dagirkeriya Tirkiye û çeteyên wê mezintir e**

Tirkiye ji roja ku Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê rêveberiya xwe ya xweser ava kiriye ve bênavber êrîşên xwe didomîne. Herî dawiyê balafirên Tirkiyeyê yên bêmirov di 9'ê mijdarê de êrîşek li Qamişloyê pêk anî. Di êrîşa ku li taxa Hilêliyê pêk hat de Yûsif Gulo û du neviyên wî yên bi navê Mazlûm û Mihemed Gulo jiyana xwe ji dest dan.

Bi hezaran qamişloyî li Goristana Şehîd Delîl Saroxan kom bûn û cenazeyê malbata Gulo spartin axê. Endama Desteya Hevserokatiya PYD'ê Foza Yusif axivî û diyar kir ku Apê Yûsif jiyana xwe xistibû xizmeta doza kurd û Kurdistanê.Foza Yûsif di berdewama axaftina xwe de diyar kir ku dewleta tirk bi rêya hedeftgirtina kesayetên welatparêz dixwaze vîna gelan bişkîne û wiha got: "Em ji Erdogan re dibêjin me bi şehîdan dest pê kir, şoreş bi şehîdan berdewam dike. Em natirsin ku, şehîdan bidin."

Li hemberî van êrîşên dewleta tirk her çiqas ji tu dewletên navneteweyî bertek nehatibin nîşandin jî li hundir û derveyî welat gelê kurd, dostên wê, nivîskar, siyasetmedar, akademîsyen, sazî û dezgehan bertek nîşan dan û derketin qadan.

Meclisa Sûriyeyê ya Demokratîk (MSD) komkujiya ku dewleta tirk li Qamişloyê pêk anî, şermezar kir û bang li civata navneteweyî kir ku firîna balafiran li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê qedexe bike.

**Banga MSD'yê**

MSD'ê di banga xwe de wiha got: "Em bang li civata navneteweyî dikin ku qedexeya firîna balafiran li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ferz bike. Em banga helwestên navneteweyî yên li hemberî sûc û binpêkirina peymanan, dikin. Ev yek diyar dike ku rêzdariyê nadin qanûnên navneteweyî. Em banga parastina aramiya herêmê dikin. Bi rêya ferzkirina qedexeya firîna balafiran dê Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ji xetereya rêxistinên terorîst ên wekî DAIŞ`ê rizgar bibe."

**Bi hezaran kes derketin qadan**

Bi hezaran welatî li bajarê Qamişloyê li dijî komkujiya Hilêliyê bi dirûşmeya 'Em ê heta dawiyê xwedî li şerê gelê şoreşgerî derkevin' meşiyan. Bi hezaran qamişloyî ji qada Şehîd Xebat berê xwe dan mala malbata Gulo ya li taxa Hilêliyê. Girseyê li dijî êrîşên Tirkiyeyê hêrsa xwe nîşan dan.

Ji Helebê heta Girkê Legê û Til Hemîsê bi sedan şêniyên bajaran bi meşê êrîşên dewleta tirk şermazar kirin.

**Dewlet krîzê bi êrîşan vedişêre**

Der barê mijarê de nivîskar û şîrovekarê siyasî Mustefa Ebdo axivî û wiha got: "Di demên dawî de, dewleta tirk a dagirker û çeteyên wê êrîş û gefên xwe yên li dijî herêmên Rêveberiya Xweser zêde kirine. Hin sedemên van êrîşan girêdayî rewşa Sûriyeyê ye, hin jî girêdayî rewşa cîhan û Tirkiyeyê ne. Dewleta tirk a faşîst di hundirê xwe de, di nav krîzan de ye. Di mehên borî de, siyaseta wê li tevahiya qadan têk çû, lewra ew dixwaze bi êrîşên ser Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê hin armancan bi dest bixe."

**'Dixwazin projeya me têk bibin'**

Ebdo da zanîn ku ji bo têkbirina projeya Neteweya Demokratîk, dê dewleta tirk serî li her rêbazê bide û axaftina xwe wiha domand: "Dewleta tirk heta niha ji Amerîka û Rûsyayê re erêkirineke li gorî xwesteka xwe -ku bi êrîşan qirkirina gelê Rojava ye-, negirtiye. Lê fikarên ku vê erêkirinê jî bigire hene. Gefên dawî yên dagirkeriyê di asteke bilind û cidî de ne û ji bo wê jî amadekariya xwe kiriye."

Mustefa Ebdo li dijî êrîş û gefên dewleta tirk bal kişand ser girîngiya yekitiya gelên herêmê û wiha domand: "Pêwîst e gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê tev cihê xwe di nava berxwedana azadiyê de bigirin. Dagirkeriya Tirkiyeyê ji bo gelên herêmê tevan xeter e. Lê dê yekitiya gelan hewldanên dagirkeriyê bêbandor bike û dagirkeran ceza bike. Vîn û berxwedana gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ji dagirkeriya Tirkiye û çeteyên wê mezintir e."

**Dixwazin dagirkeriyê fireh bikin**

Mustefa Ebdo têkildarî dijminatiya dewleta tirk bi gelên resen re û rêbazên wê yên qirkirinê wiha axivî: "Bi armanca tunekirina gelên resen, dewleta tirk serî li her rêbazê dide. Bi taybetî gelê kurd dike armanca êrîşên xwe û li hemberî wan planên qirêj zêde kirine. Ji ber wê divê gelên herêmê hişyar bin û bi şerê taybet neyên xapandin."

Mustefa Ebdo di axaftina axaftina xwe de ji bo xirakirina planên dagirkeran ji gelên herêmê xwest ku bibin destek û wiha got: "Ji gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê tê xwestin ku li destkeftiyên xwe yên şoreşê xwedî derkevin û tev li nava berxwedana azadiyê bibin. Divê her kes di aliyê fikrî û fizikî de xwe perwerde bike û pêş bixe. Yekitiya gelên herêmê wê dagirkeran ji holê rake."



# Gelo kurd dê li Bexdayê li hev bikin an...

Serdem Silo

Di qada siyasî ya iraqî û kurdî ya niha de piştî hilbijartinên Iraqê ku di 10'ê cotmehê de hatin lidarxistin, der barê qonaxa piştî hilbijartinan gelek pirs derketin holê ku tevgera El-Sedir cihê xwe di pêşiya lîsteya serkeftinê de girtiye. Niha ew rikberê herî xurt li hemberî hêzên bi ser Îranê ve ye. Li gel nakokî û gengeşeyên ku giştî Iraqê tê re derbas dibe, gelo kurd di avakirina şandeke hevgirtî û xurt de ji bo Bexdayê dê li hev bikin, an dê weke serdema borî li hev nekin.

Li gorî daneyên ku Komîseriya Bilind a Hilbijartinan ragihandine ku nûnertiya bêtirî ji sedî 95 ji encamên dengdayînê dike, ango bloka Tevgera El-Sedir 73 kursî, hevpeymana Teqedûm jî 37 kursî, Dewleta Yasayî 36 kursî, Partiya Demokratîk a Kurdistan (PDK) 32 kursî, hevpeymana El-Fetih 17 kursî, El-Ezim 15 kursî û Imtîdad ku nûnertiya xwepêşanderên cotmehê (Tişrînê) dike 12 kursî bi dest xwe ve anîne.

Namzetên serbixwe jî nêzî 40 kursî bi destxistin û li gel wan jî 5 kursiyên kota xiristiyanan di nava wan de 4 jê yên Tevgera Babîliyon in ku alîgirên Îranê ne, sê kursiyên din jî yên kota êzidiyan, Şebek û El-Saîbe El-Mendaîyîn in.

Beriya hilbijartinên Iraqê Yekîtiya Niştimanî ya Kurdistan (YNK) û Tevgera Goran hevpeymanek bi navê (Hevpeymana Kurdistanê) avakirin da ku bi yek lîsteyê beşdarî hilbijartinan bibin. Partiyên din jî û di serî de PDK tena serê xwe beşdarî hilbijartinan bûn. Lê ji ber tecrûbeya yekemîn di hilbijartinên Iraqê de ku sîstema elektronîk hat bikaranîn, li seranserî Iraqê gelek sextekarî çêbû û heta niha dosya sextekariyê çareser nebûye.

Heta niha partiyên ku bi ser neketine hêzên derve û hundir tawanbar dikin ku sextekarî di jimartina dengan de kirine. Li Herêma Kurdistanê hêzên kurdî PDK'ê tawanbar dikin ku li deverên têde serwer e sextekarî kiriye. Hevpeymana Kurdistanê jî daxwaza jinûve jimartina dengan li derdorên Hewlêrê dike. Partiya Azadî û Demokratîk a Êzdiyan jî PDK'ê tawanbar dike ku li derdorên Şengalê û deverên ku êzdî têde bi cih bûne û di kampan de sextekariyê kiriye.

Piştî hilbijartinan jî partiyên kurdî li Herêma Kurdistanê dest bi civînên xwe kirin. PDK, YNK û Tevgera Goran li bajarê Silêmaniyê civînên berfireh lidarxistin ta ku hevpeymanekê ku nûnertiya kurdan bike avabikin û karibin mafên gelê kurd di parlemana Iraqê de û bi taybet cîbicîkirina madeya destûrî ya 140'î bi dest bixin. Lê diyar e tu encam ji van civînan nehatin wergirtin.

Di pêşbirka ber bi Bexdayê de û ji bo postên wezaretan bi dest bixin PDK'ê rêzecivîn bi aliyên Iraqê re lidarxistin. Bi taybetî bi Îtîlafa Malikî û Tevgera El-Sedir û El-Teqedûm ya bi serokatiya Mihemed El-Helbûsî û hin hêzên din re civiyan. Armanca vê jî ew e ku pareke xwe ji hikûmeta Iraqê ya werbigire.

Van civînên ku PDK'ê lidarxistin aliyên Şîayî (yên bi ser neketine) dilgiran kirin û tavilê rêze daxuyanî dan û têde hemû civînên PDK'ê red dikin û diyar kirin ku beriya ragihandina encamên dawî yên hilbijartinê ew tu hevpeymanên siyasî qebûl nakin.

Gengeşeyên li Iraqê jî bi lez derdikevin û alîgirên partiyên bi ser neketine çalakiyên nerazîbûnê li pêşiya devera kesk a Bexdayê lidardixin û êdî xwepêşandanên ku encamên hilbijartinan qebûl nakin derdikevin. Her wiha li Bexdayê jî di 5'ê mijdarê de xwepêşandêr û hêzên ewlehiyê bi hev ketin û di encamê de xwepêşandêrekî jiyana xwe ji dest da û hin kes jî birîndar bûn. Di 7'ê mijdarê de jî li dijî Serokwezîr Mistefa El-Kazimî êrîşeke bi balefirên Drone yên bêpîlot pêk hat.

Tevî ku derfeta avakirina hikûmetê niha tune ye yan jî gelek bi pirsgirêk e, heta niha hêzên kurdistanî yên li Herêma Kurdistanê nikarin şandeyeke kurdî ava bikin ta ku bikaribin mafên gelê kurd bi destbixin û bi taybet doza cîbicîkirina madeya 140'î a destûra Iraqê. Çavdêr diyar dikin ku hêzên kurd nikarin şandeyeke xurt ji bo Bexdayê ava bikin. Sedema vê yekê jî serhişkiya PDK'ê û rêbaza wê ye ku ji bilî xwe tu kesî li pêşiya xwe nabîne. PDK'e heta niha civînên veşartî û yên aşkera lidar dixe da ku cihê xwe di hikûmeta Iraqê ya bê de xurt bike.

# Di bin siya gefan de diyaloga bi Şamê re

Dildarê Amedê

Di bin siya gefên artêşa tirk û çekdarên girêdayî wê de yên li dijî herêmên Xweseriya Demokratîk , Rûsyayê dîsa bangên xwe yên ji bo diyaloga di navbera Rêveberiya Xweser û rejîma Şamê de dike.

Rûsyayê di van rojên dawî de dîsa bi heyeteke Rêveberiya Xweser re hevdîtinan dike û di van civînan de dê rê û rêbazên diyaloga bi rejîmê re werin nîqaşkirin.

Gefên dawî yên dewleta tirk li dijî herêmên cuda yên wekî Til Refat a gundewarên Helebê û heta Til Temîr a Hesekê û Eyn Îsaya Reqayê berdewam dikin.

Wiha xuya dike ku Rûsya di bin siya van gefan de dixwaze ku Rêveberiya Xweser tawîzên mezin bide rejîmê û herêmên di bin kontrola xwe de bispêre rejîmê. Lê Rêveberiya Xweser jî di ferqa vê yekê de ye û dibêje ku ji bo diyalog pêk were divê taybetmendiya herêma Rêveberiya Xweser were naskirin û destkeftiyên herêmê yên ku bi bedelên giran hatine bidestxistin werin parastin.

Nêzîkatiyên rejîmê ji van diyalogan heta niha, nêzîkatiyên ku nedihatin qebûl kirin bûn. Rejîm dixwaze rewşê vegerîne wekî beriya sala 2011'an ango her tişt vegere bin kontrola hikûmeta Sûriyeyê lê kurd jî vê yekê tu caran qebûl nakin.

Rayedarên Rêveberiya Xweser, gelek caran dubare dikin ku ew ji diyalogê re amade ne û ew dikarin bê şert û merc dest bi vê diyalogê bikin. Lê rejîm her wekî me got di xewnên beriya sala 2011'an de dijî û wekî ku van 10 salên dawî tiştek nebûbe.

Niha hem Rûsyayê zextê li Rêveberiya Xweser dike hem jî gefên hikûmeta tirk û çekdarên girêdayî wî berdewam dikin. Lewre jî beriya şerekî leşkerî yê ku dibe pêk were niha şerekî dîplomasî heye.

Dewleta tirk wekî carên berê bi rihetî erêkirina Rûsya û Amerîkayê negirtiye, lewre jî heta jî artêşa tirk û çekdarên muxalefetê yên girêdayî wê tê, li pey provakasyona ne û dixwazin şervanên HSD'ê bikişînin nava şer.

Mînaka dawî ya beriya çend rojan li bajarê Qamişloyê jî qewimî yek ji wan provakasyonan e. Bi balafirên bêmirov li Qamişloyê komkujiyek pêk anî û di encamê de 3 welatiyên kurd li ber deriyê wan kuştin.

Ji aliyekî din ve li gorî agahiyên rayedarên HSD'ê li seranserê xetên sînor ên di navbera wan û artêşa tirk de her dem ji bo bersivdayîna êrîşan di haziriyê de ne.

Her ku zext û gefên hikûmeta tirk li dijî herêmê zêde dibin ewqasî destê Rûsyayê jî li herêmê xurt dibe, ji ber ku di dema dawî de li hin deverên Eyn Îsa û Til Temirê hêzên xwe bicih kiriye û tevgera xwe ya li herêmê zêde kiriye.

Ev tevgerên Rûsyayê yên dawî gelek peyaman dide aliyên cuda. Ji Tirkiyeyê re dibêje ku ew ne razî ye ji pêkanîna operasyoneke leşkerî. Ji Amerîkayê re dibêje ku ev herêm herî dawî dê bikeve bin destê min. Ji Rêveberiya Xweser dibêje ku hûn bi ya min nekin dê artêşa tirk hin deverên din bixin bin desthilatiya xwe. Her wiha ji rejîmê re dibêje sûdê ji van zext û gefan bigire û diyalogeke li gorî dilê xwe bi kurdan re bike.

# 'Em ê eslê xwe ji bîr nekin'



Kadrî Esen



Di salên dawîn de desthilata AKP'ê polîtîkayên xwe yên pişaftinê yên li dijî kurdan şidandiye. Ji bo vê jî bi partiya faşîst û netewperest a Tirkiyeyê MHP'ê re dostaniyeke kûr daniye. Ji sala 2015'an ve li gorî vê dostaniya bi MHP'ê re polîtîkayên bêyom li dijî kurdan tên diyarkirin. Di çarçoveya van polîtîkayan de geh êrîşî xwezaya Kurdistanê tê kirin, geh êrîşên leşkerî tên lidarxistin û geh jî êrîşî çand û zimanê kurdî tê kirin. Jixwe operasyonên qirkirina siyasî û çandî qet ranewestiyan.

Armanca vê polîtîkayê korkirina hestên neteweyî yên kurdan e. Dixwazin kurd bi kurdî nejîn û xaka ku li ser dijîn weke Kurdistanê neyê pênasekirin. Lê di berteka Cemîl Taşkesen a li Sertê ya li dijî Seroka Giştî ya ÎYÎ Partiyê Meral Akşener û akademîsyenê kurd Hifzûllah Kûtûm a li Zanîngeha Firatê de derket holê ku asta vê polîtîkayê çi dibe bila bibe vala ye û li cem kurdan bi qasî serê derziyê pere neke.

Baş e ku pere nake. Heke pere bikiraya wê desthilata AKP û MHP'ê bigihîştina armanca xwe. Dema ku bigihîştina armanca xwe dê ne Taşkesen ne jî Kûtûm karibûna rastiya kurd û Kurdistanê bianîna ziman. Divê her kurd nirx bide berteka Taşkesen û Kûtûm û bibîne ku bi gotina kurd û Kurdistanê mirov çiqas bi rûmet dibe.

Rast e herdu hatin binçavkirin lê piştre hatin berdan. Lewre tu demê peyvên kurd û Kurdistanê nebûne sûc û wê ji niha û pê ve jî nebin sûc. Kê dîtiye ku ferdên neteweyekê ji ber anîna ziman a netew û xaka xwe hatine girtin û ceza li wan hatine birîn. Ji bilî çend dewletên mîna Tirkiyeyê ku hîmê wan li ser înkar û tunehesibandina netew û baweriyan hatiye avakirin.

Ji vir şûn de jî dixwazim qala çîroka akademîsyenê kurd Hifzûllah Kûtûm û malbata wî bikim. Dema ku Kûtûm hê nehatibû berdan, min bi telefonê xwe gihad dayika wî Qudret Kûtûm û pêre li ser çîroka wan axivîm. Belê Kûtûm li Xarpêtê ket rojevê û hat binçavkirin û girtin. Lê ne ji Xarpêtê ye. Kûtûm ji bajarê Cemîl Taşkesen ê ku got, 'kurd, zimanê kurdî û Kurdistan tune tê hesibandin' Sêrtê ye.

Malbata Kûtûm ji gundê Zîvzîk ê navçeya Şîrvan a Sêrtê ye ku bi hinarên xwe bi nav û deng e. Malbat ji ber sedemên aborî di salên 1980'yî de ji gundê Zîvzîkê koçî Enqerê dike. Hifzûllah li vir dest bi dibistana seretayî dike. Piştre ji ber malbat di sala 1998'an de ji Enqerê koçî Stenbolê dike, Hifzûllah heta lîseyê perwerdeya xwe li Stenbolê didomîne. Zanîngehê jî li Zanîngeha Adnan Menderes; beşa maliyeyê dixwîne. Ji ber ku ji Kurdistan a ku kirin hinceta girtina wî dûr dijî Hifzûllah baş bi kurdî nizane. Beriya salekê hestên neteweyî pêre xurt dibin û bi derfetên xwe dest bi fêrbûna zimanê kurdî dike.

Dema li malbatê geriyam birayê Hifzûllah Ahmet Kûtûm telefon vekir. Piştî ku min xwe pê da nasîn bêyî ku tiştekî bibêje telefon da dayika xwe Qudret. Piştî min pirsa wê kir destpêkê min ev pirs jê pirsî: "Dayê der barê rewşa kurê xwe Hifzûllah de dixwazî çi bibêjî?" Dayika Qudret ev bersiv da: "Kurê min tiştekî şaş nekiriye û tiştekî xirab negotiye; li çand, nasname û li mezinên xwe xwedî derketiye. Ev ne sûc e. Ez li pişt kurê xwe me. Xwîna min birijînin jî ez ê li dû kurê xwe bim."

Piştre dayika Qudret bi kurtayî ev tişt gotin:

"Min gefên li dijî kurê xwe li ser înternetê dîtin. Ji bo xemgîn nebim ji min re qet qal nedikir. Ji ber ku gotinên kurê min li xweşa wan neçûne ew girtine. Ma kesî bihîstiye ku tirkek bibêje ez kurd im. Em jî ji dê û bavê xwe ve kurd in û em ê dev ji kurdî jî bernedin û eslê xwe ji bîr nekin.

Min kurê xwe di nav şertên zehmet de da xwendin. Aboriya me ne baş bû. Ji bo kurê min bixwîne min nexşan çêdikir, difirot û bi perê wan kurê xwe da xwendin. Divê kurê min ji peywirê neyê girtin û careke din vegere ser karê xwe. Gefên li dijî kurê xwe nas nakim. Li şûna ku kesên êrîşî kurê min dikin bigirin kurê min digirin. Em mafdar bin jî dewlet me mafdar nabîne.

Çi jî bikin em ê dev ji çand û zimanê xwe bernedin. Ez û bavê Hifzûllah hê jî li malê bi kurdî diaxivin. Zarokên me jî ji kurdî fêm dikin lê nikarin biaxivin. Kurdî û Kurdistan ji wan re serbest e lê ji kurê min re qedexe ye. Li gorî kêfa xwe tevdigerin. Neheqiyê li kurê min dikin."

# Çalakiya bêîteatiya sivîl: Nobeda edaletê

Xidir Xelîl Brahîm

Mirovên aqilbiçûk û tima ji ber çavnebarî, zewq, koletiya nefsê û xezeba îqtîdarê ewilî li ser xwezayê serdestî kirin. Piştî demekê êdî serdestî li ser civakê kirine. Wan hêz û mirovan ji ber tima û îqtîdarê, xwestin her tiştî têxin xizmet û kontrola xwe. Ji bo vê yekê hertim ketin pey fen û fûtan. Hertim serî li hîlekarî, fêlbazî, qurnazî û zordestiyê dan. Xwestin li ser ên din serweriyê bikin. Hertim xwestin bi sedan, hezaran û milyonan mirov di xizmeta wan de ji bo wan bijîn. Îro ji ber hemû navendên sermayeyê xistine destê xwe û dewlet jî dane pişta xwe, bi milyonan mirovan betal dihêlin û piştre li gorî daxwaz û pîvanên xwe kar didin wan. Li gorî daxwaz û pîvanên xwe mirovan ji kar davêjin. Hertim wan bi birçîbûnê terbiye dikin. Dema kêfa wan dixwaze jî digirin û qetil dikin.

Di dîrokê de piştî kom û hêzên serdest di nava civakê de pêş ketin, her dem li dijî van hêz û koman berxwedanek jî pêş ket. Hêzên serdest û kedxwar hertim xwe spartin hêza dewletê. Hêzên bindest û mafê wan tê xwarin jî hertim xwe spartin civakê. Di dîrokê de her ku zilm û serdestî pêş ketiye, li dijî vê yekê berxwedan û serhildan jî pêş ketiye. Yek ji van çalakiyên serîhildanê, çalakiya Bêîteatiya Sivîl e. Bêîteatiya sivîl îro li Pira Deriyê Sêmalka û Edliyeya Rihayê di pêşengiya dayikan de berdewam dike.

Bêîteatiya Sivîl, yek ji çalakiyên bêtundî û bêçek e. Her çend ne li gorî zagonan û qanûnan be jî rewa ye. Ji bo parastina mafê aliyekî ye. Esasê vê çalakiyê dijderketina zagon û qanûnan e. Serîrakirina li dijî îqtîdar û desthilatdaran e. Li dijî pîvan û qaydeyê dewletê ye. Hin caran bi girseyî, hin caran takekesî ye.

Ku mirov li dîrokê dinêre, gelek çalakiyên bêtundî û bêxwîn ên li dijî serdestan derdikevin hemberî me. Çend bûyerên serhildana bêîteatiya sivîl ên mohra xwe li dîrokê dane nîşan didin ku dema girse bi rêxistin û bawerî be teqez encamê distîne. Li gorî çavkanî û belgeyan Henry Thoreu yê li bajaroka Concorde ji dayik dibe, di sala 1946'an de li dijî "Baca seriyan" derdikeve. Ji bo ku bacê nede raziye şevekê bê girtin û li girtîgehê bimîne. Ji ber ku Henry Thoreu bawer dike ku dewlet bi bacan dibe dewlet û bi van bacan serdestiyê li welatiyan dike. Bi vê girtina xwe dixwaze li dijî pergala koletiyê derkeve.

Bi vî şiklî yekem car li dijî pergal û zagonên dewletê serî rakir û daxwazên dewletê qebûl nekir.

Dewlet hertim dixwaze bi milyonan mirovan bike koleyê xwe û di xizmeta xwe de bikar bîne. Ji bo ku wan bi hêsanî bêdeng û bêîrade bihêle jî li gorî berjewendiyên dewletê zagonan ava dike. Van zagonan jî pîroz dide nîşandan. Hewl dide bi zagonan rê li pêş çalakiyên dijberî xwe bigire.

Di dirokê de kesayetiyên navdar ên wekî Leyla Guven bi çalakiya greva birçêbûnê, Ayşe Gokkan bi rûniştina li ser sînor, Kemal Pîr, Hayrî Dûrmuş bi rojiyên mirinê, nivîskarê amerîkî Henry David Thoreau, Mahatma Gandhî bi meşa li dijî baca xwê, Rosa Parks, Paul Lafargue, Martin Luther King, Dalai Lama û Lev Nikolayeviç Tolstoy bi çalakiyên xwe yên Bêîteatiya sivîl encam girtine û bi ser ketine. Bi çalakiyên xwe li dijî siyaseta rêveberiyên dewletê derketine û bi ser ketine. Çalakiyên Bêîteatiya Sivîl bi navekî din çalakiya bêtundî. Hertim dixwaze bi rêya aştî, diyalog û bêtundiyê daxwazên xwe çareser bike.

Di van çalakiyan de welatiyên ku di nava kargerî (fabrîqe), pergal û dewletekê de mafê wan têne binpêkirin, ji bo mafê xwe bi dest bixe, serî li rê û rêbazên berxwedana bêtundî dide. Her çend çalakî û berxwedan ne li gorî hiqûq û zagonên dewletê be jî rewa û mafdar e. Ev çalakî ji aliyê her kesî ve tê dîtin. Aşkera tê kirin. Azad fikrên xwe tînin ziman. Heta ku daxwazên wan pêk tê di çalakiyên xwe de israr dikin. Taybetmendiyên vê çalakiyê li dijî hiqûq û zagonê ye. Li dijî pergal û dewletê ye. Rewa ye. Bêtundî ye. Ji raya giştî re vekirî ye. Gelek cure û şêwazên van çalakiyan hene. Hin şêwazên sereke ev in: Çalakiyên rûniştinê yên li qadên ku ji raya giştî re vekirî ne, girtina rê, dirêjkirina li erdê ya li qadên navendî, dagirkirina saziyan, kampanyayên îmzeyan, çalakiyên birçîbûna grevê, çalakiyên rojiya mirinê, rûniştina li ser sînor û hwd.

Li gorî qotara Erica Chenoweth û Maria J. Stephan çalakiyên bêîteatiya sivîl ji sedî 53 bi ser ketine. Çalakiyên bi tundiyê jî ji sedî 26 bi ser ketine.

Niha Emîne Şenyaşar û kurê xwe Ferîd Şenyaşar ji ber ku zilm li wan hatiye kirin û 3 kes ji wan hatine kuştin 252 rojin ji bo "Edaletê" nobeda edaletê digirin. Dayik li Pira Deriyê Sêmalka li dijî PDK'ê zêdeyî mehekê ne kon vedane. Her ku diçe serdanên çalakiyê zêde dibin. Her ku diçe xwedîderketina li çalakiyê zêde dibe. Lê tişta balkêş Serokê CHP'ê Kemal Kiliçdaroglu ku ji bo "Edaletê" 420 kilometre ji Enqereyê meşiyabû Stenbolê, lê vê çalakiya dayik Emîne Şenyaşar nabîne. Eger em bawer dikin ku em mafdar in û çalakiya me rewa ye, wê demê divê her kurd berê xwe bidin Ruha û Sêmalkayê.





Dewey Ma

Cemîl Oguz
cemilo@diyarname.com

## Başak Xanime

Sewîyeya Başak Demîrtaşe ya entelektuelî, siyasî, çandî çi bo muhîm nîyo. Çi yo muhîm û enka biya meseleya ma weşikîya aye ya. Bêşik û nîqaş Başak Demîrtaş xanim pîrekêke weşik a. Enka şima go vacê ene mesele çi ya veciya? Ma qal bikerin…

Dinya de çapemenî bi xo azad a û het nêgîna. La welatanê zey Tirkîya de, zey ma kurdan de çapemenî het gêna. Goreyê aye joy ra nûçeyan, fotografan kena vila.

Ez zî tede, enî cayan de heme rojnamegerî ana yê: Tenê ke ma înan ra hes bikerê ma fotografanê înan yê weşikan; ê ke ma înan ra hez nêkerê ma fotografanê înan ê ke weşikî niyê kenê vila. Rûdawî zî ana kerdo. Mesela Başak Demîrtaşe.

Roja 11.11.2021'î de Mehkemaya Cezaya Girane ya 6'inan ya Amedî 2 serrî û 6 aşmî ceza daye Başak Demîrtaşe û doktorê aye.

Sebeb?

Bi îdîaya "raporê tenduristî sexte viraşta û nêşiya kar" ceza ro aye birna. Mehkema, ene dewa, serra 2018'inan de kerd a û enka ceza ro înan birnaya. Mehkema bi ene îdîaya ma arde ziwane ceza da aye û doktorê aye R.B. ke rapor kerdbî hadre. La Parêzerê aye çîna vano:

"Enî tarîxan de (qalê tarîxanê seranê 2015'inan kenê ke mesela a çaxî viraziya wa) Başak Demîrtaşe semedê tenduristî xo çende rey (Tarîx, jo bi jo nistê) şiya doktor, bi hemle biya, tût vera şiya, enî tarîxan de amelîyet biya. Mehkema tenî bawna qeydanê Navenda Tenduristî aye Malbate ra zî go enî çiyan bivîna û ene xetay xo bikera raste."

Enî çî derdê mehkema niyê, a meselay ke bîn a. Meselaya ma çapemenî ya. Heme çapemenî, çapemenî kurdan zî ene mesela kerde xebere û kerde vila. Yew çapemenî kurdan ra Rûdawî zî xebere viraşte la fotoyo tewr xirab ê Başak Demîrtaşe tedir kerd vila. Foto de Demîrtaşe fekakerdî ya û weşik nêeysena.

Erê, wexto ma joy ra hes nêkerê ma fotoyê înan yê xirabî kenê vila. Mesela wexto qalê Hîtlerî beno ma fotoyê ê tewr xirab kenê vila. Û Rûdaw ke qaşo çapemenî kurdan a fotoyê Demîrtaşe tewr xirabe kena vila. Di hetî ro ene çî şaş a: Yew, goreyê vatişanê parêzeranê aye ra Demîrtaşe mexdûr a, gere çapemenî wayîr ro ci veciyo, nê ke aye tewr xirab bimocno ra. Di, ti çapemenî kurdan ê, ti çawey fotografê pîrekêke weşike yê tewr xirabî kenê vila?

Wexto xeberdan yeno serê xeberdanî vanê "Bê Rûdawî ra hez bike, a zî çapemenî kurdan a". Ka rewşêke anayîn de ez o çawey Rûdawî ra hez bikerî?



# Çar parçeyî ra yew veng "Kobanê"



Av. Cemile Turhalli



Wexto ke qala Kobanê yena ma vîrî, sarê ma beno berz. Wexto ke yewî vat Kobanê, sereberzîya şarê ma yena vîrê ma. Kobanê semedê ma hişmendîya ma ya giran a. Kobanê seba ma herra mergî xo ser ra eştiş a. Kobanê semedê ma serkewtiş a. Binxetî ra ameyîş a û serxetî ra zî şîyayîşê kurdan a.

Tarixê ma de erdê ma senî talan bîyo, ziwanê ma zî talan bîyo. Kurdî bîyî lete lete la hema zî vera nêdayo hişmendîya xo lete biba. Plansazîya dewleta hegemenî aseno ke ma vila kerdî. La ez wina qebul nêkena. Ez zana ke ma vila nêbîyî. Ez zana ke ma vîndî nêbîyî. Çunke ma heme zanê ke ma estê. Vakûr zano başûr esto. Başûr zano rojhelat esto. Rojhelat zano vakur esto. Sînorê ma, ma nêviraştî. Heta haya ma, ma ra biba ma ne vîndî benê ne zî vila benê. Sînor çîyêko viraşte yo. La hişmendîya netewe viraşta nîya. Hişmendîya şarî helbet sînorî zî raşt keno.

Kobanê hişmendîya kurdan arda pêser. Hişmendîya kurdan kerda fikrê miletan heminan. Verê ci kurdan yewbînan nêşinasnayêne la nika heme dinya kurdan şinasnena. Helbet wina rehet nêbi. Senî destê kurdan yewbînan resayî înan rê qewetêko gird ardo. Nê qewetî sereyê kurdan berz kerd. Wexto ke sereyê merdimî senî bî berz, o sere çiray nêno war. Çimkî sereberzkerdiş vînayîşê dinya yo. Wexto ke yew dinya bivîno êdî nêeşkeno vînayîşê xo vera bido.

Kobanê kifşê ma kurdan heminan a. Letekerdişê ma ra pêserbîyayîşê ma heminan o.

1ê Teşrîna Peyêne 2014î de sey roja Kobanêye ame qebulkerdiş. Na roje ma heme zanê ke yew roje de nameyê xo nêgirewto. Na roje, nameyê xo qîrîya cinîyan, bidestê xortan û kaykerdişê gedeyan ra girewto.

Cuya kurdan heta nika sey kokê daran bi. Heta nika kokê kurdan parçe bî, la nika yew kokê xo kerdo derg nika Kobanê de bîyo gilê daran. Gilê bînan zî vera vera xo resnenê erdê bînan. Kokê ma xo zereyê erdî de zî keno derg, serê erdî de zî xo keno derg û beno gildar. Çend ke gildar benê milçikê daran zî benê zêde. Çend ke benê derg sîya înan zî bena derg. Çend ke gildar benê pelê daran zî benê zêde. Çend ke benê gildar derg benê meyweyê înan zî benê zêde.

Heta nika dewletanê muktedîran nê kokî birnayîbî. Nêzanê ke kokê kurdan zaf o. Yew kokî birnenê koko bîn beno pîl, di kokan birnenê çar kokî benê zêde. Çimkî kokê kurdan çar parçe bîyo la her lete de xoser zî eşkeno bibo pîl. Senî waştêne ke rojawa qir bikî, vakurî ganî xo da rojawa, rojawa hîna pîl bi û hêz girewt. No hêz helm dano ma heminan.

Kobanê serewedartişê ma heminan a. Nê rojan de nê serewedaritişê kurdan wazenê ke bikî bindestîya kurdan. Dewletan sucê pîlî serê hereketanê cîhadîstan kerdî. Nê herbî de waştêne ke wa kurdî reyna bibî şamîya înan. La tarîxî na reye seba kurdan tekerrur nêkerd. Heme parçeyanê bînan de kurdî seba xo ameyê pêser. Neheqîye qebul nêkerde û heqê xo waştî û heqê xo her ca de pawitî.

Kobanê nêkewte çimkî Kobanê kiftê kurdan ser o û destê kurdan ser o bîye.

Hîris serran ra ver senî nêşêyayî sereyê sîyasetmedaranê kurdan bîyarî war nika zî nêşenê sereyê înan bîyarî war. Çimkî polîtîkaya kurdan tena yew ca de nîya. Polîtîkaya kurdan zereyê şarê ma de ca girewta û awan bîya. Aye ser o kam bêro şaristananê kurdan, şarê ma bêters û bizerrî ra şêno nameyê erdê xo vajo.

Polîtîkaya kurdan sey polîtîkaya partîyanê merkezinan nîya. Polîtîka seba kurdan serewedaritişê cuye ya. Nê serewederatişê ma cayê xo girewto û bêters serekanê partîyanê nasyonalîstan ra vatişanê xo texsîr nêkeno. Şarê ma vano ke semedê xo meyîn verê ma, eger şima yenê verê ma xo vîr ra mekî ke linga şima ha erdî ma ser o ya. Erdê ma bizanî û bişinasnî. Nameyê ey Kurdistan o. Kurdistan welatê ma yo, kokê ma ha erdê ma de yo. Eger şima wina qebul nêkenê şima rê oxir bo.

Şima vînenê ke ne eşkenê vengê ma bibirnê ne zî eşkenê sereyê ma bibirnê.

Vizîr Kobanê de kamî hêriş kerdo, kamî waşto wa Kobanê bikewo, no zîhnîyet na reye zî kurd û dostanê kurdan ra heyfê xo gêno. Çimkî sucê înan pîl o, sucê înan hendê pîl o ke nêtemerîyeno. Her cayî ra no suc eşkera bîyo. Semedê ke sucê xo bitemerno sucanê bînan keno. Sîyasetê înan gineno dêsê kurdan ro. Sereyê sîyasetmedaranê kurdan her tim berz o, seke Sebahat vana "Şima qebul bikerî nêkerî ma kurd ê. Ma yew şar ê. Heqê şaran senî estê heqê ma zî estê. Heqê ma seba qebulkerdişê şima nîyo."

Ma vatişê xo nika nêvato. Vatişê ma serewedaritişê kalikanê ma ra heta nika yeno. Seyîd Rizayî senî ke mehkemeyanê îstîklalî de sereyê xo nêard war, înan rê bî derd. Senî ke Şêx Seîdî înan ra vat "Ez xo raya şarê xo de feda kena, ez nê semedî ra poşman nîya. Helbet tornê ma nê vînenê. Ma verê dişmenê xo de nêşermayenê no zî ma rê bes o."

Meydanê Çarçirayî de zî Qazî Muhammedî vatibî:

"Mektebe persayêne di rey di keno çend? Her kesî vatêne çar. Mi her tim matematîkî ra kêm girewtêne. Çimkî goreyê mi di rey di yew kerdêne, nêkerdêne çar.

Mi gore didan, ziwan û lewî nêkenê çar pêro benê yew, benê veng benê qîrî.

Mi gore, di polî, di lingî nêkenê çar parçe benê yew leşe û bi yewî xebitîyenê.

Mi gore, cîran, keye, cade, kuçe nêkenê çar, benê şaristan û tede pîya ciwîyenê dewletî, feqîrî û şar.

Mi gore, kok, govde, gil û pel nêkenê çar, benê yew dare û hem kilm hem zî derg.

Mi gore, eşq, zerrî, rindî û safî nêkenê çar, hetê waştîye de kenê yew. Nê nimuneyî ke vanê di rey di nêkenê çar zaf ê û bêpeynî yê.

La tena ez nê zana ke eger leşa mi parçe parçe bikî, guleyan mi ser o bivarnî, mi dar de bikî zî do zerrîya mi her tim nê vaja;

Kurdistan yew welatêk a, nêbena çar"

Nê vateyanê rayberanê ma kurdan hêz da ma, ma kerdî yew. Vatişê înan sereyê ma berz kerdo û nê semedî ra sereyê ma nêno war.

1ê Roja Teşrîna Peyêne roja yewîya ma kurdan a. Roja yewîye pîroz ba.

# Do cayê hêrişanê kîmyewîyan de cigêrayîş bikera



Rêxistina Heqanê Merdiman ya Dinya ya ke Amerîka de xebatan kena û Komeleya Mexdûranê Kîmyewîyan yê Helebçe pîya kombîyayîşêk kerd. Xeylêk kesî tewrê kombîyayîşê 'Domananê Vînîbîyayeyan yê Helebçe' bîyî.


Kombîyayîş de hêrişê kîmyewî yê dewleta tirke yê vera Herêmanê Pawitişî yê Medya zî ameyî nîqaşkerdene. Rêxistina Heqanê Merdiman ya Dinya soz da ke ê do nê herêman de cigêrayîşî bikerê.

Berpirsîyarê Rêxistine Seyîd Selah Baxçeyîyî kombîyayîşî ser o eşkerayîye da û vat: "Ma do dosyayanê domanan ê vînîbîyayeyan yê Helebçe bikirişê Ofîsê Rêxistina Heqanê Merdiman ya Dinya. Na semedê domanan gamêka weş a.

Rêxistine bire daye ke herêmanê Başûrê Kurdistanî de ke dewleta tirke tede çekê kîmyewî şuxilnayî cigêrayîşî bikera. Ma do qetî ney ser o xebate bikerê."

Serekê Komeleya Mexdûranê Kîmyewîyan yê Helebçe Lokman Abdulkadîrî da zanayene ke ê do semedê domananê vînîbîyayeyan şorê verê pêro beran û îfade kerd ke Rêxistina Heqanê Merdiman ya Dinya zî semedê hetkarîya ney soz daya înan.

Helebçe de 83 keyeyî wazenê ke 114 domanê ke hêrişan de vînî bîyî bêrê dîyene. ***SILÊMANÎ***




# Mirina M. Kemal

Fatma Taşli

Rojekê li herêma Qerejdaxê, ji nav eşîra Şehîn a gundê Çepenya yek diçe eskeriyê. Çend mehên wî diqedin, di dehê mijdarê de, roja mirina M.Kemal e. Dema ku seat dibe, 9 û 5 deqe, her kes dikeve rêzgirtinê, dibê wîze wîza korneyên makîneyan û herkes di cihê xwe de di sekinin û destên xwe bi kêlekên xwe ve dişidînin û bêdeng dimînin. Feqîrê ku yek gotinek ji tirkî fêm nake û ji bûyerê ne agahdar e, bi çavên matmayî li derdora xwe dinere, devê xwe dixe guhê hevalê xwe û bi dengekî nizim dibêje:

- Çi bûye bira, ev çi ye, xêr e?

Hevalê wî dibêje.

- Huşbe kuro bêdeng be, M.Kemal îro miriye.

- Wîîî malaminêêê. Çawa miriye, qeza kiriye gelo, an bi emrê xwedê miriye ?

- Huşşşş be bêdeng be li ber xwe binereeee.

Roj û meh dibihurin,eskerî diqede bi zor û zahmet.

Berê xwe dide gundê Çepenya yê Qerejdaxê.

Gundî lê dicivin û pirs li ser pirsê jê dikin.

- Ka bêje li wan welatan çi hebû û çi tunebû?

- Weleh saxî û silametiya canê we.

Ez du sala mam li eskeriyê, ez fêrî zimanê tirkî nebûm û emrê wî ji we re be çend meh berê M. Kemal jî mir. Dema ku wer dibêje, ew cemaeta ku navê M.Kemal qet ne bihîstibûn,destê xwe didin ber rûyên xwe û xwe xemgîn dikin û bi ser xwe de diponijin.

Birayê wî yên jê mezintir ku beriya wî bi deh salan eskerî kiribû û vegeriyabû, ji cihê xwe rabû li birayê xwe nerî û got.

-Na birê min,tu xeletî, îsal deh sal M.Kemal miriye!

Tê fêmkirin ku birayê mezin jî heman tiştî jiyaye. Dema li eskeriyê bûye, di dehê mijdarê de, bi bêdengî rêz hatiye girtin, dema ku pirsiye, jê re gotine.

- Ma tu nizanî îro M.Kemal miriye.

Ji wî ye ku dema ew li eskeriyê bûye wê demê Wiha miriye.

Belê ev ne çîrok e, serpêhatiya Evdirihmanê Çepenya ye.

Mixabin bi hezaran bûyerên wisa hene.

# Parsek e bi şûr û qetek e

Zilamek hal xweş her roj ku ji malê derdiket 1000 kaxet pere dida parsekê ku li serê kolana wan rûniştibû. Piştî demekê perê ku dida parsek daket 750 kaxetî. Mêrikê parsek di dilê xwe de got de ew jî başe ez napirsim çima kêm kiriye. Piştî çend mehan êdî her ew parsek didît 500 lîre dida wî. Carekê dîsa serê sibehê mêrik hat ber bi parsek ve û 500 lîre xiste destê wî. Mêrikê parsek got heyra mala te ava be tu hertim qenciyê bi min dikî lê ez dibînim ku her demekê tu pereyan kêmtir didî min, sedem çi ye?

Mêrik got: Tu rast dibêjî destpêkê zarokên min biçûk bûn, min 1000 dida te, paşê kurê min çû zanîngehê min hinekî kêm kir û tenê 750 da, niha jî keça min diçe qursê min hinekî din ji perê te kêm kir.


Parsek got: Heyra ma çend zarokên te hene?

Mêrik got: 4 zarokên min hene.

Parsek got: Hoho ma îca çavê te lê ye tu zarokên xwe tevan li ser pişta min xwedî bikî heyra?

De were safî bike, bi rastî jî wekî berê gotine hinek kes wekî vî camêrî hem parsekin û hem jî bi şûr û qetek in. Di jiyana rojane de jî hinek caran wiha çêdibe. Wekî mînak tu karekî ku ne karê te ye dikî û piştre ew jî dibe barekî nû li ser milê te û heke tu wî karî nekî gazinc ji te tên kirin.

# Tiştanok (mamik)



Me dîsa ji we re çend tiştanok ango mamikên xweş amade kirine. Her wiha em dixwazin hûn ji kerema xwe tiştên li ba xwe binivîsin û ji me re rêkin E-maila rojnameyê da ku em wan jî biweşînin.


**1-**Ez çûm hewşekê
Halhala şivanekê
Heft berxê li ber beranekê
Gelo ew çi ye?

**2-**Tiştek min heye
Mamê mino
Ez çûm nava garanekê
Çêleka biçûk heft çerm e
Kî dizane ew çi ye?

***Çavkanî: Mamikên Botanê***
***Berhevkar: Rênas Xendekî û Dildar Botî***

**Bersivên me ev in:**
**1-** Mirîşka kurk û çêçikên wê **2-** Pîvaz

# XAÇEPIRS




**JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ**

1. Rûpel, bask 3. Paşnavê helbestkarekî kurdên bakurê Kurdistanê ...
5. Heskirin, hezkirin, eşq 6. Meşrû, heq 7. Bere, rû
9. Cihê ku berhemên çandiniyê lê kom dikin, her wiha cihê koma pûş
12. Mûçe, perê mehane yê heqdest 14. Sewaleke kedî ji bo goşt û hiriyê tê xwedîkirin
15. Kesên ji welatê Urdunê 17. Dirb 18. Kar û xebat 22. Qenctirîn, çêtirîn

**JI JOR BER BI JÊR**

1. Zehf, gelek
2. Rih
3. Yan
4. Cejin
5. Daneke rojê
7. Gelekî resen ê Mezopotamyayê
8. Pêxemberek
10. Ji niha şûnde
11. Temen
13. Elok, balendeyeke ji mirîşkê mezintir
14. Kevirekî hêja ku jê morîkan çêdikin
16. Dehl, tûm
19. Xwarina êvarê
20. Xebat
21. Cihê ku genim lê tê hêran
23. Hewa

## Bersiva hefteya borî



# Hunera civaka hiyerarşîk û wek antîtez hunera civaka demokratîk 2



Îlham Bakir



Li gor bindestan, yên ku keda wan tê xwarin, yên ku tên birêvebirin, yên ku dixwazin cîhaneke heqane, wekhev, bêçîn, bêkedxwarî û adil ava bikin. Divê huner wek du beşan hunera civakbûnê û hunera bûrjûwaziyê bê şîrovekirin; berhemên ku tên afirandin vegotina hunerî ya ku hatiye pêkanîn, ka yên pergala bûrjûwaziyê ne yan jî xizmeta gel dikin divê li gor pîvanekê bên destnîşankirin û li gor alîgirbûnê mijar bên nirxandin. Ev ne helwesteke talî ya ku li gor ekoleke hunerî yan jî têgihîştineke hunerî bê diyarkirin e. Ev rewşeke bingehîn a li gor ka kîjan xeta şaristaniyê tê tercîhkirin e. Hilberîna hunerî yan dê ji xeta şaristaniya demokratîk re xizmetê bike, yan jî dê bibe payandeyeke şaristaniya bûrjûwaziyê. Ango gava ku hunermend ji destpêka hilberîna xwe ya hunerî ve li hilberîna xwe ya hunerî difikire, ji bo hilberînê daneheva pêwist pêk bîne, çavkaniyên xwe diyar bike, alav û amûrên ku dê bi kar bîne, cihê hilberînê, qada parvekirina hilberînê, cih û rêbazên parvekirinê diyar dike, vana hemûyan li gor xeteke tercîhan pêk tîne. Tu asteke hilberîn û parvekirinê ji vê xeta tercîhan serbixwe bi pêş nakeve, nikare bi pêş bikeve. Divê di çarçoveyeke çînî û birdozî de huner bê nirxandin. Nêrîna ku dibêje huner di ser birdozî û çînan re ye û divê di ser wan re be, hunera ku birdozî pê digere vediguhere navgîneke propagandayê ya req a bêgiyan, divê hunermend serbixwe be û xwe bi tu birdoziyê ve girênede. Argûmanên ku îro herî zêde li derdorên hunerî tên bilêvkirin û yek ji rêyên têgihîştina hunerê ne. Bêguman ên ku herî zêde van gotinan dikin, derdorên hunerê yên bûrjûwayê, hunermendên bûrjûwayî û rexnegirên hunerê yên bûrjûwayî ne. Gava ku vê yekê dikin, hunermendên şoreşger ên ku ji aliyekî ve di şert û mercên pir giran de hewl didin ku pêdiviyên xwe yên rojane bi cih bînin. Dema xwe ya ji derveyî vê hewldanê li gor rastiya hêzên civakî û gel ji bo hilberandina hunerî bi kar bînin, derdixin derveyî vê qada hilberînê ya li dijî pergala kapîtalîst. Naveroka birdoziya hunera wî/ê vala dikin, wî/ê dikin parçeyek ji koma hunermendên bûrjûwayî. Ji aliyê din ve jî hewl didin ku tevahiya derfetên madî û manewî yên hilberîna hunerî ya çînên jêrîn ji holê rakin.

Gava ku mirov ji vî aliyê ve lê dinêre, ligel ku hunermendê/a şoreşger ne xwediyê derfet û mercên hilberînê yên hunermendên bûrjûwayê ye jî ya rast gava ku hunermendê/a şoreşger ji nebûna derfetên hilberînê gazinan dike, ya rast dibêje şert û mercên wî/ê yên hilberînê tune ne. Ew dixwaze li gor pîvan, rêbaz û şert û mercên hilberînê yên hunera bûrjûwayê tevbigere. Ango ligel ku lingên wî di nav rastiya wî/ê ya civakî de ne jî, laş û seriyê wî/ê di nav qada hunerê ya bûrjûwaziyê de digere. Ku rewş ev be, bûrjûwazî yan bi pêkutiyan dike ku ew dev ji hilberînê berde, yan jî dike ku ew ji rastiya xwe ya civakî qut bibe û wî/ê tev li qada xwe ya hunerî bike.

Bûrjûwazî hunerê li gor çawaniya wê li hinek ast û kategoriyan dabeş dike. Ji bo ku ji wan kategorî û astan derbas bibin, divê dev ji bîrdoziya xwe ya çînî û awayê jiyana xwe ya çînî berdin. Hunera herî baş, rastîn û cewherî hunera ku ji aliyê çîneke perwerdehiyeke baş wergirtiye û bûye xwediyê jiyaneke astbilind ve hatiye afirandin e. Hunermendên muxalîfên pergala bûrjûwaziyê ji bo ku bikaribin li qadên ku bûrjûvazî pîvanan diyar dike hilberîna xwe ya hunerî pêk bînin divê pîvanên têgihîştina hunera bûrjûwaziyê esas bigirin, li gor vê estetîkê tevbigerin, li qad û cihên diyarkirî hilberîna xwe pêk bînin û li qadên ku bûrjûwazî hêja dibîne berhemên xwe yên hunerî pêşkêş bikin. Bi vî awayî dikarin bibin dûvikê hunera pergala bûrjûwaziyê. Hunermendek bi rastî jî bêyî ku van sînorên elît ên ku ji bo hunerê hatine danîn parçe bike, heta ku çîna navîn a ku dûvika qada civakî ya bûrjûwaziyê ye terk neke, qadên xwe yên hilberîn û parvekirinê, çavkaniyên xwe yên xwedîbûnê li gor rastiya gelê xwe diyar neke, nikare hilberîneke dijber pêk bîne.

Yên ku xwe wek hunermendên şoreşger û muxalîf bi nav dikin, li qadên ku ji aliyê desthilatdariyê ve tên destnîşankirin û sînorên wan tên diyarkirin, li gor pîvanên ku wan diyar kiriye hilberîna xwe ya hunerî pêk tînin. Ev jî qeyrana herî bingehîn a vê qadê ye. Ev yek dike ku di navbera armanc, rêbaz û encamê de nelihevkirineke bingehîn derkeve holê û bi vî awayî hunermend bikeve nav qeyranê. Desthilatdarî gava ku di motîvasyon û mercên hilberîna hunerî ya bindestan de qeyraneke bi vî awayî pêk tînin, xeta di navbera hunera civakî û hunera bûrjûwayê de jî nediyar dikin û dikin ku yên ku li ser navê hunera şoreşger hilberînê pêk tînin fam nekin ku çawa ji bûrjûwaziyê re xizmetê dikin. Hunermendên muxalîf ên ku bikevin nav tora têkiliyên hilberîn û bazarkirinê yên ku pergala bûrjûwaziyê bi awayekî hiyerarşîk ava kiriye, ne pêkan e ku careke din îflah bibe. Tişta herî trajîk jî ew e ku ligel heta kûrahiya dil û mêjiyê xwe taybetiyên hunera bûrjûwaziyê dijîn jî hîna jî xwe wek hunermendekî/e muxalîf û şoreşger dibînin. Îro di nav derdorên muxalîfên pergalê de tişta ku herî zêde û herî berbiçav tê jiyîn ev rewşa xwexapandinê ye. Aşkera ye ku heta di navbera van her du têgihîştinên hunerê de xeteke qalind neyê kişandin, bi rastî jî ne pêkan e ku hunereke li dijî pergala heyî bê afirandin. Pergala ku te dixe nav tora xwe ya têkiliyan a heyî bi tenê dihêle ku tu di nav kategoriyên hiyerarşîk ên ku wê diyar kiriye de û li gor asta ku wê destûr daye de hilberîna hunerî pêk bîne. Hunermendên ku di bidestxistina çavkaniyên madî de astengiyan dijîn bi dayîna piştgiriya madî, bi tevahî bi xwe ve girêdide. Ji bo hunermendên ku şerm dikin ji dewletê piştgiriyê bigirin an jî ji hilberandina bi piştgiriyeke bi vî awayî aciz in jî bi rêya fon û weqfên cuda derfetên piştgiriyê pêşkêş dike û rêya ku wan bi xwe ve girêbide dibîne.

Wisa be tişta ku divê hunermendên dibêjin em muxalîf in, li dijî pergala heyî ne û ji bo gel û gelan hilberîna hunerî pêk tînin bikin ev e: Li dijî hunera pergala civaka hiyerarşîk afirandina hunera civaka demokratîk e. Ji bo hunermendên kurdistanî hilberîneke hunerî ya bi vî awayî pêk bînin, motîvasyon û şert û mercên civakî û polîtîk ên pir mezin hene. Tevgera Azadiya Kurdistan bi îtîraza xwe ya nuwaze û li gor vê îtîrazê jî pêşniyazkirina jiyaneke alternatîf nîşan daye ku cîhaneke din pêkan e. Ji bo vê yekê jî daneheva teorîk û pratîk jî afirandiye. Tişta ku divê hunermendên kurdistanî bikin ev e: Divê binihêrin gava ku Tevgera Azadiya Kurdistan bi wê angaşta wiha mezin derdikeve holê û vê daneheva mezin diafirîne hêza xwe ji ku werdigire.

Divê tevahiya têkiliyên pergalê bên redkirin, ji bo xwedîbûna ramanî û estetîk li çavkaniyên xwe vegerin, nirxên gelê xwe û nirxên gelan ên gerdûnî esas bên girtin. Ev destpêka kar e. Piştî vê yekê, di tevahiya astên hilberînê de bi hêza xwe ya cewherî, bi avaniya xwe ya rêxistinî xwe hekirin û wek ku pariyê nanê xwe bi gelê xwe re parve dike parvekirina berhemên xwe ya bi gel re divê nêzikatiya bingehîn ve. Divê li estetîka ku kurdistaniyan bi sedsalan di encama afirandina civakîbûnê de pêk anîne û dawerivandine xwedî bê derketin. Divê ev estetîk di şert û mercên îroyîn de bi paradîgmaya azadiya Kurdistanê re bên têkelkirin û pêşvebirin. Ev ne tenê tercîhek e, di heman demê de ji bo ku mirov li hemberî pergala kapîtalîst bikaribe li ser piyan bisekine û bibe alternatîf jî ev tiştekî bivênevê ye.

# Piştî lêkolîna 31 salan Avesta hat çapkirin

Îndo-cermenîst, îndo-îranolog, avestolog û kurdolog Beyhanî Şahîn piştî 31 salan beşek ji vekolînên xwe yên li ser Avestayê ji bo çapê amade kir û Weşanxaneya Na'yê vê bejê bi navê 'Avesta1: Gāthāyên Zarathuštra' çap kir.

Beyhanî Şahîn li ser Avestayê diyar dike ku Zarathushtra bi xwe destpêka manthrayê(dengbêjê) ye. Ji ber wî jî ew ê pireya di navbera poetîk ya destpêkê û bi dengbêjan ve avabikin. Lewma ew cîlda yekemîn ya Avestayê diyarî Evdalê Zeynikê dikin.

Şahîn li ser çend Avestayên ku ji weşanxaneyên din hatine çapkirin jî dibê alaqeya van wergeran bi zimannasî û daneyên akademîk tune ne. Têkiliya Avestayê bi ziman, wêje, huner, felsefe, civak, hiqûq, astronomî, tib û hemû jiyana ku hatiye jiyîn û nejiyîn heye.

Ev vekolîna di cîlda yekem da ji 3 beşan pêk tê

1. Destnivîsên resen yên Gāthāyan ku di sala 1323'yan de hatine nivîsîn ango kopye kirin, wekî wêne di cîlda yekem da yek bi yek hatine bicihkirin.

2. Di beşa duyem de tevahiya Gāthā'yan bi fonda Avestayê hatiye nivîsîn.

3. Di beşa sêyem da hemû Gāthāyên Zarathushtra yek bi yek hatine trenskrîpkirin.

Dawiya Avestayê de bi alfebeya zimanê Sogdî belgeya herî kevn a ku dîroka wê diçe heya piştî mîladê sedsala 9'emîn hatiye bicîhkirin. **ÎZMÎR**




# 'Çîrokên nûjen ên jinên îranî'



Pirtûka bi navê 'Jiyan û Jin; Çîrokên nûjen ên jinên îranî' ya ku behsa çîrokên nivîskarên jinên îranî dike ji weşanxaneya Sîtavê derket.Çîrokên jinên îranî ji aliyê Raziye Tuccar ve hatin berhevkirin û Çetîn Taş ji ev çîrokan ji zimanê farisî wergerandiye kurdî. Di serê her çîrokê de pêşî nivîskarê xwediyê çîrokê hatiye danasîn piştre çîroka wê hatiye dayîn. Pirtûk ji 295 rûpel pêk tê û 36 çîrokan têde hene. Pirtûk bi çîrokên wek 'Ez û Piçûk', 'Zilamê Pir Serfiraz!', 'Nazaferîn', 'Beden', 'Piştî Sê Rojan', 'Du Çûkên Berfê', 'Şikilek û Du Kes', 'Aliyê Agir' nerîneke cuda li berxwendavana vedike. **WAN**

xwebûn
15-21 Mijdar 2021 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 5 TL Hejmar: 100

İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi: Kadri Esen
Sorumlu Yazişleri Müdürü: Elif Can Alkan
Yayın Danışma Kurulu: Abdulla Peşêw
Ehmed Huseynî
Kakşar Oremar
Selîm Temo
Dr. Zerdeşt Haco
Yayın Türü: Haftalık Yaygın Süreli
Yönetim Yeri: Kooperatifler Mahallesi Cahit Sıtkı Tarancı Sokak İstanbul Apartmanı No: 18/6 Yenişehir / Diyarbakır
Baskı: Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı Bağlar / Diyarbakır

Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.
Ji bo abonetiyê
Tel:0 (541) 806 84 85



Şîndar Akinci

# Tundiya hestiyarî

Tundiya hestiyarî di nav cureyên tundiyê de ya herî zêde berbelav e û di heman demê de ya herî kêm tê behskirin e. Dîsa ya herî dijwar tê ferqkirin jî tundiya hestiyarî ye. Mixabin li seranserî cîhanê; gelek kes, hema bibêjin hemû zayend dikarin bi hestyarî mirovên li dora xwe bi tundiyê rakin. Kesên ku tundî li wan hatiye kirin dikarin di pêşeroja xwe de vê tundiyê li yeke/î din jî bikin. Ji bo mirov bikaribe vê çerxê xirabike, divê mirov pêşî vê tundiyê nas bike. Piştre divê van pirsan ji xwe bike; "Gelo ev tundî qet li min hatiye kirin?" û "Gelo min ev tundî li kesên din kiriye?"

Tundiya hestiyarî (tundiya derûnî, îstismara derûnî, îstismara hestiyarî) cureyek ji êrîş û îstismarê ye ku kirdar bi awayek hestiyarî kesên stembar kêm dike. Diçewsîne, bi sepandina cezeyan wî/wê ji civakê dûr dixe. Kirdarê ku vê tundiyê dike dengê xwe li ser yên mexdûr bilind dike. Wî/wê ditirsîne, sixêfan dike, tehdît dike, heqeretê dike, biçûk dixîne, her car rexne dike; liv, cil û berg, têkiliyên wî/wê kontrol dike, sînordar dike. Bi hesta xwe kêmdîtinê û bi awayekî sîstematîk tundiyê li mexdûr dike. Bi piranî di têkiliyên hestî de, di nav malbatê de yan li devera mirov lê dixebite tê dîtin. Di têkiliyên hestî de gelek mînakên vê tundiyê hene, dibe ku bê zerar dest pê bike lê kesê îstismarker wexta bibîne hûn nikarin xwe ji vê têkiliyê qut bikin, bi cureyên din û bi awayekî zêde vê îstismarê didomîne. Li gor zanyaran heger hûn di têkiliyeke toksîk (toksîk bi wateya yekanê jehr e, hema em wek tekiliya toksîk bikartînin di vê nivîsê de, wateya wê jî têkiliya ku zerarê dide me, me bextewar nake, diqeherîne jixwe bi piranî di mijara tundiya hestiyarî de tê bikaranîn) de bin û hûn nikaribin xwe ji wê têkiliyê qut bikin bizanibin ku di paşeroja we de jî têkiliyên bi vî rengî çêbûne, yan jî hûn bi têkiliyên wisa mezin bûne. Ev ne sûcê we ye, ji ber vê yekê xwe hesas û qels hîs nekin. Heke hûn di têkiliyeke wisa de bin teqez ji derdora xwe yan ji derûnnasekî alîkariyê bixwazin. Guman heye ku îstismarker jî di paşeroja xwe de hatiye îstismar kirin, têkiliyên wî/wê yên toksîk çêbûne, divê ew jî tedawî bibe. Jixwe em her carê li her deverê dibînin; tundî, tundiyê diafirîne.

Yek ji sedema dijwariya dîtin/hişyarbûna vê tundiyê jî di têkiliyê de tiştê baş e. Ji ber vê mirov kêliya îstismarê ji bîr dike yan di serê xwe de red dike. Wexta di nav malbatê de dê û bavê we tiştekî ku hûn dixwazin wekî bi tenê derketina derve û piştre bibêjin 'Ez ji bo qenciya te vê dibêjim' ev jî tundiya hestiyarî ye. Wek xoşewîst an hevjînê/a we bêyî xwe di têkiliyê de we kêm bibîne; wekî ku bêje "ku nikare bêyî min bijî, tu yê ne serkeftî bî, wê jiyana te serobino bibe" ev jî bawerîya mirov a bi xwe dişkîne û dibe tundî. Wekî din hevalên me di nav civatan de bi henekî we kêm bixin an jî li cihê hûn lê dixebitin mînak; we kêm bibînin, bi piranî gotina we bibirin, we nehesibînin/nebînin. Li wê derê ya li hemberî we tê kirin, wekî mînak; daxîna karên riswakirinê yan karên kû pir zêdeyî we yan jî di bin kapasîteya we de be, ew jî dibe tundî. Her wiha derew û xapandin jî.



Wexta hûn bertekê nîşanî van kiryaran bidin û bibêjin ev tundiya hestiyarî ye, wê demê hin kesên li derdora we yan jî îstismarker dê bibêje "çawa çêbû fişal neke". Bi piranî kesên bi zihniyeta erkî dijîn vê yekê dikin ev jî dibe tundî. Ji ber ku hestên we, ev tişta ku we jiyaye, bi vî awayî biçûk dikin, hûn di xwe de pirsgirêk dibînin, xeletî dibînin. Heke we li derdora xwe kesên wisa dîtin tiliya xwe bixin çavên wan (ne bi awayek rasteqîn/bi axaftinê). Tu tişt ji derûniya mirov, baweriya mirov a bi xwe girîngtir tune ye. Bi piranî dubareya tundiya hestiyariyê kesên mexdûr dixe bin tesîra tirsê/metirsiyê. Mexdûr ji ber wê metirsiyê tên asta dînbûnê, xwe depresîf hîs dikin, dixwazin bimrin, xwe bikujin, girêdayîbûna madê û alkolê dest pê dike, hestê xwe sûcdardîtin û fedîkirin bi wan re çêdibe.

Windakirina xwesteka cinsî, êşên cinsî û yên kronîk dest pê dikin. Yanî rê li ber nexweşiyên fizîkî vedike. Têkiliyên malbatî, civakî û zayendî xerab dibin. Her car westiyayî, bêxew an jî pirsgirêka zêde xwarin-qet nexwarin dest pê dike. Her mirov cîhanek e, ez dibêjim mirov dikare bi derûniyek baş bibe sedema laşekî baş jî û ruhekî baş jî. Wexta mirov baş be civak jî baş e.

---

# Dîroka avabûna aş û aşvaniyê

Nasirê Torî

Mirovan bi çandina genim û avakirina şaristaniyê re, ji genim arvan, savar û berhemên din bi dest xistin. Mirovan ji bo ku genim, ceh, garis (gilgil) hwd. bihêrin bi rêzê; destar, deng (du ferên aş: bi alikariya dewaran dihat gerandin) aşê avê, aşê bayê, aşê agir (girêdayî trektoran bûn) û îro jî aşê ceryanê (elektrîkê) derxistine û genim bi wan febrîkan tê hêrandin. Alavên berê winda dibin. Der barê dîtina aşê avê de dîrokeke zelal tune ye. Li gorî dîroknas û arkologan; aşê av û bayê B.Z hatine avakirin. Aşan jiyana mirovan gelek hêsan kiriye. Mirovên pispor aşê avê digerandin. Ji wî mirovê pispor re digotin qeraşan-aşvan. Aş bi şev û roj digeriya. Qeraş ji 10 kodik (elb) genim kodikek genim heqê hêrandinê disitand.

Rêbazên teqez (pevguhartin) di civaka kurdan de hebû. 3-4 kes dibûn şirîk û karê aş dikirin. Şirîkatiya wan jî wekî hîseyan bû. Aş li gorî pişkan veqetandibûn şev û rojan. Mînak; 8 par şev û 9 par roj hwd. li gorî pîşkan ji 10'an yek ji xwe re hildianîn. Bi aşê avê re çandeke aşvaniyê çêbû, wê çanda aşvaniyê bi awayekî komunal bandora xwe li ser ziman, civak, jiyana wî gelî çêkir. Bi taybetî li ser ziman û civaka kurd bandor kir. Gelek biwêj, pêşgotin, çîrok, pêkenok tiştonek hwd. li ser aş û aşvaniyê li zimanê kurdî zêde bûn. Gotinên pêşiyan ên "Aşê dînan bêav digere", "Aş digere bi avê kur radibe şûna bavê", "Aş çûye daye pey çeqçeqokê","Aşvan tu car nabe poşman", "Aş dike, qeraş dixwe", "Aş dizivire lê kes nizane ava wî ji ku tê", "Aş bi avê digere mirov bi zimên", "Aş bêyî aşvan, axa bêyî xulam nabe" û tiştanokên wekî "Lem lemo li ber çemo ne gur dixwe ne diz dibe çi ye?" hwd. zêde bûn. Aş û aşvanî di çanda kurdan de bûbû cihê civînan, civatan, serxweşiyan, çîrok û serpêhatiyan û kesên ku şeveder diman.

**Alavên çêkirina aşên avê**

**Sikir:** Li pêşiya çemekî bi keviran, pêşiya avê digirtin, ji bo ku av di cuhokê de here ser aş. Pêşiya dîwarê sikir bi heriyê yan jî bi singên ku di ber dîwêr de dikutandin li pêşiya wan singan ji kewş, lûlik, tûreşk (dirik) hwd. didin pêşiya dîwarê sikir û berê avê berdidin cokê.

**Co:** Ji bo ku av biçe ser aş ji hêla mirovan ve firehbûna wê metroyek, dirêjbûna wê jî li gorî dûr û nêzbûna aş yan jî aviyên wan e. Carnan dema lêhî radibû cuhoka aş dixitimand. Cuhok bi palûtê paqij dikirin.

**Çala aş:** Ava ku di cuhokê re dihat pêşî di ser pişta aş re di moxileke ku ji darên bî û zilikan çêkiribûn, (jê re digotin; xefka reqa) av di wir re derbas dibû. Ji bo ku kîso, beq, req, kewş, masî, hwd. cureyên nav avê xwe bernedin çala aş da ku aş nesekine. Çala aş kûrbûna wê 9-10 metro, firehbûna wê 2 metro ye. Pergala çalê gilover e. Çala aş dora wê bi kilsê seyandiye. Ew ava ku xwe berdide çalê di binê çalê de valahî heye weke metrokeke firehe, ew av di wir de dibe yek û xwe berdide ambûbê. Ambub jî avê tengav û dişidîne û li periyê dolabê dixe.

**Ambûb:** Avê zirav û xurt dike û berê wê dide dolabê. Ambûb ji dara tuwê çêdikirin ji bo ku dara tuyê li ber avê qewîne û xerab nabe.

**Toq:** Li devê ambûbê dixistin ji bo ku hêza avê zêde bibe û li periyê dolabê bide. Li gorî kêmbûn û zêdebûna avê pîj li ber toqê didan.

**Pîj:** Ji darên bî tê çêkirin. Di nava avê de bêtir dinepixe û qewîn dibe.

**Şirik:** Ji darên tuyan çêdikin. Nava wan daran bi tevşo dikolan û dikirin şirik. Du parçe şirik didan ber hev û bi alîkariya tokê bi hevdu ve girêdidin.

**Dolaba aş:** Şiklê dolaba aş gilover e. Firehbûna wê li rexekî metroyek û nîv li rexên din jî metroyek û nîv bi tevahî 3 metro firehbûna aş heye. Dolaba aş ji dara tuyê yan jî biyê çêdikin. Piştî hêsin hat dîtin, êdî hesin bikar tînin. Di dolaba tuyê de kêm zêde 15-20 perî hene. Di dolaba hesin de 25 perî hene. Di nava dolabê de tîrek heye. Ew tîr jî ji tuyê ye. Di nav de bista hesinî hebûn. Ferekî aş li jor bû yek jî li jêr bû.

**Ferê aş:** Ji du feran pêk tê. Çar tilt dibûn. Ferek, ji bo ku fer bi tenê di rizdan de (tebeke )keviran de tune bûn, çar tilt dianîn ber hevdû û dibû ferekî aş. Ferek li binî bû yek jî li serî bû, dora ferên aş bi tokê girêdidan. Li gorî erdnîgariya herêman rengê ferê aş dihat guhertin; reş, qahweyî hwd. bûn. Madenekî hestemî bû. Ji pola û mifrik jî gewîntir bû. Di dema berê de buhayê wan feran 400-600 panot bû. Heke aş bişixuliya ji heftê carekê diviya pisporê ku ew feran dikolan, aş bikolana da ku arvan rind bihêrana.



**Dewil (Dewila aş):** Ji jor ve zêdeyî metroyekê firehe. Ji jêr de jî 20-30 cm biçûk e. Dewila aş; 200 kg, kelek (20 elb keleke) yan jî 20 elb (olçek) zad dikevê.

**Kodik:** Ji darên bî, guwîz, gûhîj dihat kolan, ji bo ku pê zad bipîvin.

**Çeqçeqong:** Ji darên bî û berû çêdikin. Erka wê zad dianîn kevîka ferê aş. Pêşiya çekçeqonkê nekirkirî ye. Dikeve keviya kodikê. Bi devê kodikê ve jî ta û diavêjin darê dewilê, bi wî tayî zad kêm û zêde dibe.

**Nigê aş:** Ji darên tuyê ye. 2 metro dirêj e. Dema nigê aş datînin, arvan hûr dihêre, dema radikin ferê aş radibe û arvan(ard) gir dike.

**Şe û bindeq:** Di nava dolabê de cih digirin. Şe dikeve nava beraze, bindeq jî dikeve nava darê dolabê. Herdu girêdayî hevdu ne. Aş li ser wan digere bêyî wan aş fetlekê jî nikare bigere.

**Beraze (Qirase):** Beraze ji dara tuyê çêdikin. 2 metro direj e, stûrbûna wî 25-30 cm û pehn e. Pehnbûna wî ji bo ku şe bikeve nava wî.

**Misraxe:** Zadê ku dihat hêrandin, xwe berdida misraxê. Firehbûna misraxê metreyeke. Çar pênc mirov bi hêsanî dikaribûn tê de rûnin. Binê misraxê jî bi heriya seyandî bû. Ji misraxê arvan berdidan têran.

**Doşeder:** Ava ku dikeve çalê li periyê dolabê dixe û piştre jî di doşederê re derbas dibe.

**Kox (Axurên aş):** Di qada aş de ye. Ji mezelek (ode) û koxekê ava dibe.

**Berhevkar:** Nasirê Torî. Çavkanî: Necî Îsayê Tilhesen. Cih: Gundê Tilhesena Kercewsa Êlîhê